



Hunermend Yusuf Çetin:

Sînemaya tirk jî wekî sîstema tirk xitimîye!

Nûçe:

Ji pakêtan tim
bombe derdikevin

Rûpel 3

Ji Girtîgiha Bartînê:

Sîstema hucreyan û
demokrasî

Rûpel 4-5

M. Bekiro:

“Em ji xwe
dûr ketine”

Rûpel 10

ROJEV

Komployên navneteweyî û rêpîvana azadiyê



SAMI TAN

Almanya ji zû ve, li pey afirandina hêzeke reformîsta li dijî PKK'ê ye. Lê di vî warî de bi ser neket.

Di nav dek û dolab û êrişên dijmin de gelê rêpîvana xwe ya ber bi azadiyê didomîne. Dek û dolên li hemberî tevgera kurd ne tenê bi destê dagirkeran tê meşandin. Plan û tevdiira êrişên mezin ji hêla hêzên împeryalist ve tên amadekirin.

Di van rojên raborî de du bûyerên ku vê helwesta împeryalistan baş didin dest, pêk hatin. Serlîstikvanê bûyerkê ji wan Îngilistan, serlîstikvanê ya din jî Almanya bû.

Rojnameya bi navê Observer bêyî ku li ser rastiya wan lêkolînê bike, cihê daye gotinên îtirafkarekî qaşo ên dûrî aqilan. Ev bûyer digel helwesta dijminane ya vê dewletê, tiştêkî din jî nîşan dide: Tevî sistema împeryalist, çapemeniya wan jî xurifiye. Lewre prensîba serekî ya rojnamegeriyê ev e ku mirov di amadekirina nûçeyekê de cihê bide dîtîna hemû aliyên bûyerê. Xuyaye ku bi zanaftî wan çavên xwe jê re vê prensîbê re girtine.

Bûyera duyemîn balkêştir bû. Lewre li gorî nûçegihanê Nîşebînê vê ajansa tirk

AA'yê, kurdên li Ewropayê li hemberî Serokê Giştî yê PKK'ê serî hildane. Serkêşiya wan jî kesên mîna Hüseyin Yıldırım, Selim Çürükçaya û Kesire Yıldırım dikin. Heke bûyer bi ew qasî bimaya, tiştêkî ku mirov bigota nîn bû, lewre kesên navborî jî meşî ve helwesta diyar kirine. Di nav gelê kurd de bi qasî serokcahşekî jî bandora wan tune. Lê tevî wan kesan, navê hîn kesên din hatibûn dayîn. Ew yek jî bû sedema têk çûna vê nûçeya derewîn. Lewre kesên ku navê wan hatibû bikaranîn bêdeng neman û dan zanîna tîkiliya wan bi vê plana kirêt tune.

Hin dikarin bibêjin çima Almanya wekî serlîstikvan hate destnîşankirin, dibe ku ajansa tirk baloneke wiha ji ber xwe teqandibe? Lê dema mirov bi hûrbîna li bûyerê binêre destkariya Almanayê derdikeve holê, qet nebe hinek agahî ji îstixbarata vê dewletê hatine standin.

Di dema serdana Mesut Yılmaz a Almanayê de rayedarên Almanya ji dewleta tirk çareserîya kêşeya kurd

dixwaze. Xuyaye ku Serokwezîrê tirk hin soz dane, lê ji bo pêkhatina wan sozan, her du aliyên li ser tunekirina tevgera kurd û afirandina alternatîfên derewîn li hev kirine.

Almanya ji zû ve, li pey afirandina hêzeke reformîsta li dijî PKK'ê ye. Lê di vî warî de bi ser neket, bi serketina wê jî ne pêkan e. Jixwe rojnameyên tirk ên ku ev nûçe wekî aleke peritî bilind kirin, nikaribûn veşêrin ku kesên navborî di bin kontrola Almanayê de ne. Li aliyê din kesên mîna Şerafettin Elçi jî, daxuyandîna PKK'ê êrişî biriyê ser PDK'ê, lewre jî gelek PKK'yî ji zivêr bûne. Ev gotin jî şayanî devê wan kesan in, lewre ji bo ku rojekê bibin serlîstikvan, îro fiğûraniya di vî warî de dipejirînin.

Xwendevanên hêja, di vî hejmarê wê hin guherin bala we bikişînin. Ev guherîn beşek ji xebata me ya ji bo pêşkêşkirina rojnameyê xweşkirin in. Xebatên me di vî warî de didomin, di rojên pêş de jî hîn hin guherînan di rojnameyê bibînin.

Ferhengok

aramî: îstîqrar, huzûr
barîdor: rewş, hal
bêrêzkari: bêhurmetî, bêrêkûpêkî
çalak: aktîf
çalakî: livbarî (faaliyet)
çavsor: hov
dabaş: mijar, babet, mewzû
demjiyan: serdem, heyam
derzîn: terikîn
êsta: niha, nika
gewre: mezin
gewr: boz
gûzan: jilêt (ustura)
heman kate: eynî wext
hêjahî: nirx, qîmet
hêman: unsûr
hêmin: sergiran, xwînsar, sakîn
hoy: merc, şert
jîngel: hawirdor
lêpirsaw: berpirsiyar
lêsohbûn: îsrar kirin, lêxweşhatin
kesayeti: şexsiyet, kesîti
kirêt: qirêj, qîlêr, gemar
kîtekî: detay
kunêr: perç, abse, çiban
mehî: miz, parînc, meaş
mûcawir: nêz, çinar
navgîn: amûr, alav, hacet
nehênî: vêşarî, nepenî, dizkî
tewanî: karîn, şiyar

nîgaş: xeyal
nûçegihan: peyamhiner
nîzamnâme: rêzname
qewazdan: di ser re derbasbûn
penaberde: penahende
peywendî: tîkîlî, danûstandin
pêjîker: hestiyar
pêşnûma: proje (tasarî)
puxteya gotinê: bi kurtayî, xulasa
ramyanî: konevanî, siyasi
rastbîn: realist
rasteqîn: rastîn, reel
ravêj: meyl
raye: otorîte (yetkî)
repisandin: dewisandin
remz: sembol, nîşan
reşbînî: bedbîn, pesimîstî
rewanbêj: xweşbêj
şanek: xal, nîşe
şayik: rawan, herîkbar
şewşbûn: gejokî (yalpalamak)
şewaz: terz, uslûp
vîn: viyan, îrade
yarîkirin: listin, henek
yarmeti: alikarî
Xal: niqte, made
zanyar: alim
zanistî: ilmî
zayendi: cinsî
zekem: arsim (nezle)
zêmar: strana şîne (ağrı)
zivêr: aciz

Mala bêxeman û gelê tirk

SAÎME UĞURLU
FATMA SAVCI

Di vî dema dawî de, gelê tirk li kabokên xwe dide; ketiye tirseke nedîtî. Ew jî pêşeroja xwe hîn bêhtir bêbawer bûye. Her çiqas serdest dixwaze vî rastiyê veşêre jî. Çiqas li peşevazî vî rastiyê tê, hîn bêhtir dilreş dibe, hêviyên mane jî dişikên.

Hûnê bibêjin ma di dema dawî de çî bûye ku ew qas rewşa gelê tirk hatiye guhartin? Em sedema vî rewşa gelê tirk bi meseleyeke me ya kurdan bîbersivînin.

Li gundekî malek bi navê "Mala bêxeman" hebûye. Rojekê ev mal dibihîze ku "Hûtê bêexlaq" hatiye, ketiye herêma wan. Malîyên vî malê li hev rûdin, diaxivî. Digihêjin encamekê û wisa dibêjin: "Li bajêr e, ma me çî jê ye. Piştî ku nehat gundê me, ne xem e" mîna berê jiyana xwe didomînin. Li bajarê ku hûtê bêexlaq ketiye nafikirin. Hût çî tîne serê gelê bajêr jî wan re ne derd e. Rojekê dîsa dibihîzin ku wa ye hût hatiye, ketiye gundê wan. Mala bêxeman dîsa jî hev re dibêjin: "Piştî ku nehat dorra me, me çî jê ye?" Piştî demeke kurt Hût tê, digihêje taxa wan. Dîsa bi sersarî dibêjin: "Ma me çî jê ye? Hey nayê mala me, êriş dibe ser kê

bîla bibe."

Eê bi gotinên mezinên me "dinya bi dor e". Hûtê bê exlaq roj tê li deriyê mala bêxeman dixê.

Demê Hût gihîşt ber derî, wê demê mala bêxeman li kabokên xwe dan. Poşman bûn. Por morê xwe kişandin. Lê çî sûd e!... Erê mala bêxeman wisan navdar bûbûn. Lê ya rastî cîranê wan, gundî û bajariyên wan jî di nav bêxemiyê mîna Mala bêxeman de bûn. Îcar gelê tirk jî

Îro şer mezin bû, ji Kurdistanê jî derbas bû, herikî Tirkiyeyê. Îro serdestên tirk, hûtê bêexlaq daye devê deriyê gelê tirk. Tiştê ku bi serê kurdistanîyan aniye yek bi yek li Tirkiyeyê jî dîke û hîn jî wê bike.

rola mala bêxeman dilîze. Gotin "Di Tirkiyeyê de şerêkî qirêj tê meşandin. Kurdên xwarin, tîne qurpandin. Serdestê wan zilmê dikin. Artêşên wan komkûjiyan pêk tînin." Gelê tirk got: "Ev tiştên ku dibêjin nayên serê me. Ji xwe bila neyê serê me, me çî jê ye." Gelê kurd qirîya û got: "Hawar, vî hûtî em xelas kirin. Malên me talan kirin, gundê me şewitandin. Xwezaya me tune kir...". Gelê tirk her demê eynî bersiv da: "Bila dewlet bavo tiştêkî

neyine serê me, bila ziyar negihêje me, çî dibe bila bibe. Jixwe ew çend terorîst in, bila wan jî bikuje."

Îro şer mezin bû, ji Kurdistanê jî derbas bû, herikî Tirkiyeyê. Îro serdestên tirk, hûtê bêexlaq daye devê deriyê gelê tirk. Tiştê ku bi serê kurdistanîyan aniye yek bi yek li Tirkiyeyê jî dîke û hîn jî wê bike. Kuştin, îşkence, girtin, birçîbûn, şerpezebûn, hemû bi serê gelê tirk de tê. Serdest vala li Derya Reş korîciyê çênakin, li ser OHAL'ê geştî rana-westin, bê sedem qedex li ser qedexeyan nayînin rojevê.

Ê ma gelê tirk li benda çî ye? Ne bi yekan nof bi nof lawên wan di nav ala wan de bi ser wan de tên. Ne tenê ev. Gelê tirk jî serdanpê di nav bêhurmetî, bê kesayeti, bêexlaqî û bêxemiyê de dihele. Gelê tirk Hîn ne di zanebûna vî belaya ku hatiye serê wî de ye. Piştî ewqas bêgodosiyê jî dîsa gelê tirk ji mala bêxema biyomtir in, lewra gerilayên dostên mala bêxeman tunebûn. Îro gerilayên gelê kurd bi hawara tirk ve jî gihîştine. Yê ku hûtê bê exlaq jî bidin sekinandin ew in. Niha em dibînin hinek jî gelê tirk diruştîyên wisa diqirin: "Susma sustukça sarsana gelecek" Her çiqas ev helwest baş be jî pir hindik e û bêguman tenê bi vî gotinê hût nayê sekinandin.



KOMİSERA Bilind ya Mafên Mirovan ku yek ji giringtîrîn rêxistinên Neteweyên Yekbûyî ye Mary Robînson, daxuyand ku ji bo çareserkirina kêşaya kurdî bihevrebûn û yekîtiya gelê kurd pêwîst e. Komîsera ku nû ji hêla kofî Annan ve hatiye tayînkirin got ku ew ji bo kurdên ku li seranserê Rohhilata Navîn belavbûne xembar e.

Her wiha Mary Robînson da zanîn ku, ji ber ku gelê kurd li nav sînoren deweletên cur bi cur belav bûye û di nav xwe de xwedî alozî û lihevistinan e, lewre ji şopandina rewşa gelê kurd û kêşeya kurd ne hêsan e.



DERHEQÊ "Rojazarokên Cîhanê" de Serokê Weqfa Zarokan Mustafa Ruhi Şirin, got ku li seranserê cîhanê ji 2 milyar 500 milyon zarokî, 600 milyon bi birçibûnê re rû bi rû ne, 15 milyon zarok bê cih û war û 130 milyon zarok jî bê dibistan in. Her wiha Mustafa Ruhi Şurûn rewşa zarokên Tirkîye û Kurdistanê jî raxist ber çavan. Li gorî daxuyaniyan ji 25 milyon zarokên li Tirkîyeyê 8 milyon belangaz, 540 hezar jî bêkes in. Li hêla din Mustafa Ruhi Şirin da zanîn ku ji herêmên Kurdistanê 6 milyon kes hatine koçberkirin, lewre jî hate gotin ku ev yek rewşa zarokên kurd yên xerab ji layê derûnî ve xerabtir dike.

NÛÇE

Ji pakêtan tim bombe derdikevin

A. Dilipak: Hewlên ji bo "Sîstemê Eyaletan" ne ji bo çareserkirina kêşeya kurd e. Ev ji bo rola ku didin Tirkîyeyê pêwîst e. Wê Bakurê Iraqê bixin bin kontrola Tirkîyeyê, pişt re derbasî Kurdistana Îranê bibin. Bi vê yekê **DYA**, Brîtanya û Fransa dixwazin hem petrola Musulê, hem jî herêmê kontrol bikin.

Hikûmeta Tirkîyeyê bi hin daxuyani û kirinên xwe balê dikşînin ser xwe. Tiştê ku niha li ser nîqaş çêdibe, "qanûna, rêveberiya herêmî" ye. Hat ragihandin ku Serokwezîrê Tirkîyeyê Mesut Yılmaz di dema serdana xwe ya Almaniyayê de, xalên li ser kêşeya Kurdistanê ji zabitan daye derxistin û diyar kiriye ku "Jixwe wê ewê di vî warî de hin gavan biavêjin. Lewre jî hewce nake ev xal di zabitan de cih bigire." Digel vê qanûnê piştî 19 salan li Kurdistanê ji bilî Mêrdînê li Êlih, Bidlîs û Çewlikê jî rewşa awarte (OHAL) hate rakirin. Rewşa nû wekî "bajarên mûcawîr" hate binavkirin.

Hinekan pêşnûmaya (tasarî) ji bo guhertina "anûna rêveberiya herêmî" wekî "ji bo Sîstema Eyaletê" amadehî bi nav kir. Tevî vê yekê hinek rojnameger û nivîskarên tirk li ser vê qanûnê û encamên wê şik û gumanên xwe anîn zimên. Ji rojnameya Sabah M. Ali Bîrand di quncikê xwe de roja 9'ê kewçêrê da zanîn ku civak hin guherînan dix-

waze, lê hinek bürokrat li ber vê yekê bûne asteng. Dîsa ji Radîkalê Tarhan Erdem diyar dike ku heta Qanûna Bîngehîn neyê guhartin, bi vê qanûnê tiştek naguhêre, lewre li gorî qanûna bîngehîn wezîrê karê hundirîn dikare serokê belediyeyê ji ser kar dûr bixe. Erdem balê dikişîne ser mamoste Beşikçi û dide zanîn ku ji bo guherînan erênî azadiya derbirina ramanan pêwîst e.

Derbarê mijarên navborî de nivîskar û lêkolînerê îslamî Abdurahman Dilipak pirsên me bersivandin.

A. Dilipak: Kêşaya kurd kronîk dibe

Dilipak, ji bo politikayên hikûmetê yên li ser kêşeya kurd reşbîniya xwe anî zimên û da zanîn ku wekî hikûmetên berê, dê hikûmeta îro jî wê ji yên berê xerabtir bibe. Dilipak wiha berde-wam kir: "Kirin û daxuyaniyên li ser betalkirina OHAL'ê ji bo xapandinê ne. Tiştên ku ji mehiya doktoran giringtir in gelek in. Tiştên ku mirov dikare bi erzanî û zûtir pêk bîne pir in. Lê, hikûmet hem xwe, hem jî kesên din dixapîne. Her diçe dem kêmkirî û kêşeyê jî kronîk dibe."

Li layê din, serokê Baroya Stenbolê Yücel Sayman û Rojnameger Celal Başlangîç roja 4'ê kewçêrê li Navenda Çanda BEKSAV'ê di paneleke darbarê "Bûyera Susurlukê" li ser OHAL'ê axivîn. Sayman hebûna "Nizamnameya Navenda Birêvebirina Krîzan" bi bîrxist û da zanîn ku ev nizamname tê wateya darbe û rewşa awarteyî.

C. Başlangîç: Guherîna vîtrînî ye

Di dawiya panelê de me li ser OHAL û helwesta hikûmetê dîtinên rojnameger Celal Başlangîç pirsîn. Başlangîç, bal kişand ser rewşa Dêrsimê û diyar kir ku li Dêrsimê û herêmê piştî salên 1992'an sîstema birêvebirinê dewletê guheriye û leşker bûne dest-



Digel ku rayedarên dewleta tirk dibêjin li Kurdistanê Rewşa Awarte hatiye rakirin, lê tê gotin ku her tişt ji berê xerabtir e.

hilatdar.

Başlangîç li ser helwesta çapemeniya Tirkîyeyê ya li hemberî Dêrsimê rawestiya û got ku, ji bilî "Dewleta kûr" (derin devlet) "Medyaya kûr" jî heye. Li gorî daxuyandina Başlangîç li navçeyên Dêrsimê solên sporê ji bo ku ne-kevin destê gerilayan hatine qedexekirin. Rojnamegerê tirk Celal Başlangîç helwesta çapemeniyê bi vê mînakê anî zimên: "Rojekê rojnamegerê diçe Tunceliyê ji gel kortên tenîsê dipirse. Lê gel daristanên ku dişewitin nîşanî wî didin. Lê ew li ser daxwaza xwe sor dibe. Dibêje 'ez ji bo nûçeya "kortên tenîsê" çêbikim hatime."

Her wiha Celal Başlangîç bal kişand ser rewşa Mêrdînê û got ku, berêvajî daxuyaniyan, li Mêrdînê guherînan ne-yinî pêk hatine, bi tene hejmarê erebayan zêde bûye. Başlangîç axaftina xwe wiha girêda: "Xuya ye rakirina OHAL'ê ji bo vîtrînê ye. Ji ber ku pêwîstiya wan bi OHAL'ê heye."

Her wiha Nivîskarê rojnameya Sa-

bahê Cengiz Çandar roja 04.10.1997 ji bo çareseriya kêşeya Kurdistanê bal kişand ser partiyên dijber yên azadixwaz û diyar kir ku kêşeya Kurdistanê bi zanebûn ji rojevê tê derxistin.

Dîsa li ser rewşa Batmanê Serokê HADEP'ê Elihê Dr. Şakir Kakaliçoğlu da zanîn ku jixwe ev 70 sal in li herêmê rewşa awarte heye. Bi vê qanûnê li her bajarê herêmê waliyekî xwedî rayeya waliyên OHAL'ê tê tayînkirin.

Serokê HADEP'ê gotina xwe wiha domand: "Heya îro gelek pakêt hatin vekirin. Lê, li şûna paketan bombe derket. Heta şer raneweste tu tişt çareser nabe. Her wiha gel ne hewcedarî alîkariya dewletê ye. Bila ji herême destên xwe bikişînin bes! Gel dikare bi îmkânên xwe problemên xwe safî bike."

Li aliyê din, li ser gotûbêjên "Sîstema Eyaletan" lêkolînerê îslamî A. Dilipak bal kişand ser planên navneteweyî û got, hin hêz dixwazin bakurê Iraqê bidin bin kontrola Tirkîyeyê.

MAZLÛM DOĞAN



Abdurahman Dilipak

Sîstema hucreyan û demokrasî

Bersiva ku dan hemû daxwazên me yên însanî û başkirina hoyên jiyane her tim îşkence û çêkirina zagonên çewsandinê bûne. Lê her car wan winda kir. Di dema leşkerî de, di dema Özal de winda kir. Goristana Eskîşehîrê ceribandî, winda kir! Li Bucayê, Umraniyeyê û li Amedê serê nezîkî bîst hevalan perçiqandin û ew kuştin, dîsa wan winda kir!..

Hikûmeta nû biryar standiye ku "biryarên MGK'ê" yên der heqê "Sîstema hucreyan" de pêk bîne.

Ew dixwaze bi vê sîstemê girtiyên siyasî ji hev veqetîne, hoyên jiyane hîn girantir bike. Têkiliyên pêwîst ên mîna hevparî, rexnekirin û hevkarîya di navbera girtiyên de tîk bike. Ew bi vê helwesta xwe di ser rastiya "mirov hebûneke civakî yê" re diqewizînin.

Qalikê hişk ê dewletê: Ataturkçîti

Têkoşîna di navbera serdest û bindestan de bi qasî dîroka mirovahiye kevne. Jixwe dîroka mirovahiye esasen çîroka vê têkoşîne ye. Çînen tirk yê serdest, ji bo berde-wamkirina desthilatdariya xwe her tim, hemû celeb û rengên lêdan, çewsandin û tero-rê li ser gelên zehmetkêş û kedkar dane me-sandin.

Generalan dest danî ser desthilatiye ev yek diyartir bû. Generalin dixwest hemû civatê bikin "Ataturkçî". Bi vê yekê armanc kuştina kesayetiya însanî û exlaqî û bîr û baweriya şoreşgerî ya girtiyên siyasî bû. Kurdan wê kurdîtiya xwe, çepgirîya xwe, mirovan wê mirovahiya xwe ji bîr bikira û bibûna tirk û Ataturkçî. Wê vî-



Serdestên komara nû li ser înkara rastiya gelan û çînan ava kirin. Lewre jî ew dixwazin gelan di nava çeperên teng ên bîrdoza fermî de bixeniqînin. Wekî gava pêşîn jî êrîşê dibin ser girtiyên azadiyê.

û îradeya wan bişkesta. Di nava qalikekî kemalistê jar de ji pêşerojê bêhêvî bimana. "Ataturkçî" tî; navgîna îdeolojîka tîkbi-rîna kesên ku cihê difikirin bû. Pêşî de bi tenê bihiştana, piştê teslîm bigirtana. Di lîteratûra siyasetê de navê vê yekê faşîzmeke reş û tarî bû.

Şerê çekdarî ev plan sero-bîn kir

Di demekê, ku li welêt û li girtîgehan bi perçiqandin qala Ataturkçîtiyê dihate kirin de, bi perspektîfa şerê çekdarî xwe birêxistinîkirin û bi der-beyên radîkal, li esasên Ata-turk xistina tevgera şoreşger, bersiva herî watedar bû.

Dixwazin civatê bixin hucreyan

Pirsgirêk bi tenê ne ew e ku, girtiyên siyasî birepisînin hucreyên ku dişibin mezelan. Ya ku di rastiya "Sîstema hucreyan" de bi ser û pê dibe, daxwaza berde-wamkirina polîtîka di qalibekî teng de guvaştin û dewisandina tîkili-yên civakî yên rasteqînî ne.

Li ser vê xakê bi tenê tirk tûne, her wiha kurd jî hene, wekî din komikên gel ên nete-veyî henene. Bi tenê çînen

serdest tunene; çîn û tebeqeyên kedkar jî hene. Bi tenê mîr tunene, jin jî hene. Bi te-nê sînî tunene, alewî jî hene û hwd.

Ev rewş di nava herîkîna civakê de dibe bîngeha cur bi cur tîkiliyên civakî; çand, sembol, îdeolojî, şeweyên ramanan û ravê-jên siyasî.

Girtiyên siyasî yên di zîndanên de jî, di vê "çarçovê" de, bi ramanên xwe yên siya-sî û bi kirin û livbaziyên xwe endam û pêş-rewanên çînen çewsandî û bindest in. Lew-ma jî xwediyê dîtinên ji yên çînen serdest cudatir û xwediyê berjewendiyên ji yên ser-destan cihêtir in.

Ev wênaya ku me bi rêzik û xetên herî stûr diyar kir, tîkiliyên vî erdî yên rast û ob-jektîf in, resmê dinyayek heqîqî ye.

Çînen tirk ên serxweş, heta îro, tîkiliyên li ser vê axê yên neteweyî-çîni û mêyl û dilxwaziyên siyasî-çandî nepejirandin.

Bi polîtîkayên înkarkirî, bi qirkirin û helandinê xwest bigihîjê dawiyê. Lê belê qenc xuya ye, ku bi ser neket. Tevgera şo-reşger a kurd û pengava dîrokî ya 1984'an li ser vê bîngeha civakî derfetên pêşvehati-nê bi dest xistin û pêk hat.

Di vê pêvajoyê de girîngtir encama ku tevgera şoreşger a kurd û şerê çekdarî afir-and, xuya ye "dinya rast û dirust" anî li ber-çavên civatê danî; "Qutiya pandorayê" ve-ker. Ev qesra ku li ser derewên heftê salî ha-tibû avakirin, hilweşand. Dinyayek berfi-rehtir û çarçova fikirîneke fireh û digel tî-kiliyên wê yên heqîqî pêşkêş kirin.

Rê li ber tevgereke nû vebûye

Li Tirkîyeyê "tevgera ji jêr ve" ya ku bi pêşketinên di civata kurd de ji aliyê objektîf ve di nava bandoreke beramberî de ye, ji ber ku di rewşa îroyîn de gelekî qels û bêhêz e, nikare qalîkê xwe bişikîne û dagirkirina milîtarîst biperçiqîne. Li bajarên mezin mēyla xwe ber bi tēkoşîna civakî nişan dide û bi pêş ve diçe. Xurtbûna vê mēylê, şikandina çeperên şovenîzmê û bi kurdan re herikîna di yek cokê de divê.

Çînen tirk ên serdest, ev heftê sale ji bo ku xwe bigihînin qonaxa "şarezayîya bilind" dixebitin. Di şarezayîya rojava de jî, di maneya "pirdengî" û "guncandiniyê de" fikra demokrasiyê yek jî xalên seretayî ne.

Lê, di tēkiliyên dewlet û civatê de rasyonalîzm nehatiye pejirandin, bi temamî felsefa hêza tund a ku di navenda wê de dewlet heye, li holê dimîne. Ji ber ku dînamîkên civatê yên hundirîn û navendên berxwedanê bêhêz in, felsefeyek dewletê ya bi vî rengî bi lez digihêje encamên xwe yên mantiqî. Lewma jî, polîtîkayên qirkirinê, îşkencê û çewsandinên li hemberî girtiyên siyasî û muxelefetê bēyî ku rastî kelemeke qewîn bēn, tēne meşandin.

Îşkence û çewsandin an demokrasi

Ji girtîgehan acizbûna çînen serdest, armanca wan a ku girtiyên siyasî di nava demê de bihelînin.

Pirsgirêk, di metoda pêkanîna van armancan de derdikeve holê. Mîna ku

heta îro kirin, vî karî wê bi îşkencê, ser û çav şeqitandinê, bi hot-zotê çareser bikin, an bi qadên jiyane yên din re. Fikra demokrasiyê hinekî be jî heta zîndan daxin û çareser bikin?...

Alternatîfa yekemîn heta niha ceribandî û derket holê ku tu encam jê nehat standin. Di ser de, mēzin û hevkeşeyên Tirkîyeyê yên navnetewî, ji vê yekê re zêde dest nadin. Di civatê de jî reaksiyon peyda dibe.

Em, mîna ku heta îro me aniyê zimên dibêjin: "M li ser qûça namûsê berxwedan nivîsandiyê", û mîna camêran em dikarin li ser soza xwe bin û çî berdêl hewce bike, em teksîr nakin. Gelê me gelekî adan e, qirkirin û tevkuştin berdewam dikin, darêza dîrokê hemû kelem û bendan hildiweşîne û diherike...

Ger bējin "demokrasi", di girtîgehan de dîl hiştin jixwe cezayek e, ji nû ve bi cur bi cur şewe û celebên îşkence û çewsandinan hoyên jiyane divê neyêne girankirin, di "nava ceza de ceza" bêdadî ye û divê dev ji vê berdin.

Yek jî, divê werê zanîn û qebûlkirin ku pejirandina fikreke siyasî û şeweyekî tevger û lebatê karê dilxwaziye ye. Bi zordarî tu kes nikare kesekî biguherîne, ger guhartinek çêbe jî, li ba hinek kesên beredayî û di nava civatê de bêtîbar wê çêbe, digel ew qas tecrûbe û ceribandinan ev rastî divê bê fêhmkirin.

Lê gava ku em li civatê dinêrin, em



Girtiyên PKK'yî yên Girtîgeha Mêrdînê

dibînin ku çînen serdest tu carî rîya îqnakirina îdeolojîk û metodên qezenckirina bi dîl nepejirandine, ji bo vê yekê qet cesaret nekirine. Bes, li pêş raya giştî her tim em bi "terorîstî" û "bêideolojîtiyê" tawanbar kirine...

Kê wînda kir

Heta îro, bersiva ku dan hiemû daxwazên me yên însanî û başkirina hoyên jiyane her tim îşkence û çêkirina zagonên çewsandinê bûne. Lê her car wan wînda kir. Di dema leşkerî de wan wînda kir. Di dema Özal de wînda kir. Goristana Eskîşehîrê ceribandî, wînda kirin! Li Bucayê, Umraniyeyê û li Amedê serê nezîkî bîst hevalan perçiqandin û ew kuştin, dîsa

wan wînda kir! Kazan-Ağar avêtina hinek gavan ceribandî, li pêşberê xwe berxwedêrên rojiya mirinê û duwanzdeh şehîdên me dîtin, wînda kirin!


Li pêş çavên mirovahiyê û dîrokê yên ku saşiyên bikin, li gorî zagon û pêdiviyên jiyane tevnegerin, wekî duh, dê îro jî û sibê jî wînda bikin.

Jiyan bi polîtîkayên îşkence û çewsandinan nameşe. Çiqas bi detay û kîtekîte hatibe hesabandin û li ser hati-be fikirin jî, encam naguhere. Delîl vê yekê jî dîroka berxwedanê ya girtiyên welatparêz û şoreşger ên 17 salên dawî ne.

GIRTÎGEHA BARTINÊ

Nivîsa nivîskarê me nekete destê me.

FAYSAL DAĞLI



Tekzîb

Çend gotin li ser nivîsa Xurşîd Mîrzengî

Merhaba xebatkarên Azadiya Welat!

Em wekî peywireke welatparêziyê her heftê rojnameya Azadiya Welat distînin, dixwin û dişopînin. Bêguman ligel gelek nivîsên baş carinan nivîsên nebaş û neyînî jî em tê de dibînin. Li gorî me divê her nivîs di şexsiyeta mirovan de tiştên baş bifirîne, divê her roj mirovên nû bi aliyê xwe ve bikişîne. Em dixwazin werin ser mijara xwe: Di hejmarê 6-12 rêzbera 1997'an de nivîseke Xurşîd Mîrzengî derket. Di vê nivîsê de gelek tiştên ku hatine gotin li gorî me ne di cîh de ne. Emê li ser van yekan yeko yeko rastwestin.

1. "Di cara ewil de yazdeh saliya xwe de, bavê wî Mizgîn aniyê Amedê."

2. "Li gund dibistan tu-

nebû, Mizgîn dibîstana nexwendibû."

3. "Mizgîn şalwar li xwe dikir."

4. "Heykel dişiband Tewfo Mala Emero. Tewfo yekî mirûziyê wî qîlêrî ye. Wekî gayekî xayîn li mirov dinihêrî."

5. "Bû pênc meh ku bizina me wînda bûye, ez dibêim bizina me wî biriyê."

Em dixwazin li ser xelatiyên van pênc xalan rastwestin.

1. Mizgîn hê di sê-çar mehiya xwe de çûye Almanya yê. Lê Mîrzengî dibêje ku ew di yanzdeh saliya xwe de ku çûye Amedê.

2. Wekî Xurşîd Mîrzengî jî dizane li gund ji salên 1960'an û vir de dibistan hatine çêkirin û wî bi xwe jî li wê dibîstanê xwendiyê."

3. Çawa ku li Kurdistanê asimilasyon çêbûye, her wiha gundiyan Zengî û Mizgîn jî nesibê xwe ji vê asimilasyonê standiyê. Mizgîn şelwar li xwe ne dikir, lê pantor li xwe dikir. Zarokatiya Mizgîn ji ber ku li Almanya yê derbas bûye rewşa aborî ya malbata wî jî ne xerab bû, baş bû.

4. Tewfo yê mala Emer, beriya sala 1965'an koçî Amedê bûye. Li vê derê em nabêjin ev şexs baş e an jî xerab e. Lê şibandina Tewfo li Kemal tiştêkî gelekî xelet e. Piştî ku ew qas sal derbas bûne, dizîya bizînekê ku mirov bîne rojevê, birînen berê bi ser ve bîne çiqas rast e û ji tiştên wiha kî, çî sîdê hevî dîke.

5. Li hêla dîn, wekî ku tê gotin ev bizin ne beriya 5 mehan, 10 zêdetir e ku wînda bûye.

Mizgîn di sala 1974'an de hatiye dinê. Lê li gorî nivîsa Xurşîd 1974+11=1985 derdikeve holê ku bûyer qewimiye. Di sala 1985'an de ew ne li welat bû, li derveyî welat bû. Şehadeta Mizgîn ne di sala 1993'yan lê di sala 1992'yan de ye.

Her kes dikare kurteçîrokên binivîse. Navên di kurteçîrokên de gelek girîng in. Mesala Xurşîd di karibû li ser gundê Zengê binivîsanda, lê di vir de bikaranîna nava û cihdana bûyerên feodalî û şerên malbat û eşîrî nexasim di rojnameyê wekî Azadiya welat de ku dengê demokrat û welatparêzan e, weşandina bûyerên wiha bêguman divê ne karê welatparêzan be.

Slav û hurmet

WELATPARÊZÊN GUNDÊ ZENGÊ

Di şexsiyeta Yılmaz Uzun de têkoşerî

Hevalê Yılmaz, ji malbateke ku hal û wextên wan li cih e. Li Sêwerekê hatiye dinyayê û li wir jî mezin bûbû. Saziya malbata wî ji derve re zêde ne vekirî bû. Sedemê vê girtîbûnê jî, kuştina birayê wî bû. Bi rengê ku li Kurdistanê em pê zanin ji bo ku bibe "Mirovê mezin" zanîngeh qedand. Dibistana sereke, navîn û lîse li Sêwerekê qedand. Ji bo wî pêvajoya qedandina lîse bû naskirina partiyê. Bi çûn û hatina mala birayê xwe yê mezin, tîkiliyê wî bi hevalan re çêbû. Hevalan nêzîkbûn û pêwendiyên wî bi tîkoşînê re çêkirin. Û di demeke kurt de bû şexsekî ji tevgerê. Hevkariya wî ya cidî ku rewşa partiyê rast dirust nas bike tunebû. Cidîbûna wî, ji nûbûnê re, ji guhartinê re vekirîbûna wî bûbû sedem ku ew pêwendiyên xurt bi partiyê re deyne. Gava li hevala guhdarî dikir xwe dida quncikekî ku, zêde hebûna xwe diyar nedikir. Em dikarin şexsiyeta wî wisa bidin naskirin, zêde ne diaxivî, şermoke bû, hinekî fedyok bû û pir jîr bû.

Di rih û ramanên xwe de beşdarî PKK'ê bibû

Ji bo em Yılmaz tîxin nav refê PKK'ê me tişt nekir. Di vî warî de tu xebateke me yî wisa ji bo heval Yılmaz çênebû. Gava em diçûn û dihatin mala wan, haya me jê çênedibû ku ew bi dan û standinên xwe yên bi partiyê re xwe bi zorê bi partiyê dide pejirandin. Beşdarbûna wî bi rengekî pir dilpak, dirust, ji can û ji dil bû. Bi saya tiştên guhdar kiribûn, pir tişt ji axaftinên hevalan girtibû. Di rih û ramanên xwe de, xwe beşdarî PKK'ê kiribû. Hê di temenê xwe yî ciwan de, xwe ser dev û rû avê-te nav tîkoşînê. Tîkiliyek sempatizanî, ji rêzê, an jî bibêje ev bes e, mîlîtanîyê-ke çalak, adeta bi çavên girtî diçû ser rîsk û xetereyan. Hê şer dest pê nekiribû jî, daxwaz û evîna wî ya ku tîkeve şer xurt bû.

Çalakvanekî jîr bû

Berî ku şer dest pê bike, wezîfe hati-bûn diyarkirin, kom hatibûn çêkirin. Dema amadekariya şerê êrîşa li hemberî Bûcakan de ew di nav komeke çalak de hatibû wezîfedarkirin. Û bi teqîna çeka ewil re wî her tiştê xwe xist bin fermandariya tîkoşînê. Di çalakiyên ku li Sêwerekê çêdibûn de cihekî wî yê xuya hebû. Em hemû taybetiyên wî yên ku me di jiyana wî ya tîkoşînê de nas kiriye, rêz bikin. Ewil em dikarin bibê-jîn ku aliyê wî yê ku zehîf derdiket pêş, çalakvayî wî bû. Wesf û xeteren çalakiyê çî dibûn ew zane, rûyê xwe jê ne-



digerand. Ev taybetiyên wî di riya rê-hevaliyê de jî ew ji hevalên wî re dikir parêzgeh. Pêwendiyên wî bi partiyê, bi tîkoşîn û bi hevalan re di asta herî bilind de bû. Ev taybetiyên wî di hemû merheleyên girtîgehê de jî hebûna xwe nîşan dan. Bi rengekî hovane qetilkirina wî jî diyar dibe ku ew xwedî pêwendiyên xurt bû. Gava barek diket ser milê wî, mutlaq ji bo ku jê encamê bistîne dixebitî. Ji aliyê teorîyê ve bi qasî ku di leşkeriyê de hînkari (talîm) nedîtibe jî çalakiyên ku wî tê de cih digirt, plan û taktîkên pir baş çêdikirin, xwedî mezi-yetên fermadariyê bû. Em dikarin vê bi hêsanî bibêjin; ew mirovekî pir kamil, dilgiran bû, cihê ku lê bû ewlekarî dida der û dora xwe. Pir fedekar bû. Wî her wext partî û kadroyên peşeng diparastin, ew li pêş canê xwe digirtin. Ne mimkûn bû ku mirov rojekê bidîta wî wezîfeya xwe neaniye cih. Gava ku berê wî diket ser leşker û hevkarên dij-min, mutlaq dixwest ew li herî pêşî be. Dixwest ji her tiştî re pîvanên sazûmaniyekê, baweriyekê bîne. Divê wateyê de ji bi prensîb bû. Mutlaq wezîfa ku girtibû dibir serî. Wî hevalên pêşketî ji xwe re dikirin mînak, aliyê wan ên baş ji xwe re digirtin.

Ji taybetiyên wî yên herî diyar yek jî; bi hevalên di sewiya xwe de û yên ku pê re xebat dikir re rihet, ewlekar, ji dil û can germ bû. Zanibû her tiştê xwe bi partî û hevalên xwe re par bike, her tiştê wî êşkere û dirust bû. Em dikarin mînakekê ji wêrebûna heval Yılmaz bidin. Hinek hevalên ciwan cesaret nedikirin ku bi serê xwe herin çalakiyan û hêza ku êşkere çeka li dijmin biteqîne bi xwe re nedidîtin, Yılmaz, ew hevalên wisa jî, bi xwe re dikişandin û dixistin nav çalakiyan.

Yılmaz, herî pir ji van tiştan hez nedikir

Wî ji pir axaftin û kêmkirinê, ji bo bûyeran peydanekirina pewistiyan, nê-zîkbûnên xwe ne parastin, li hemberî tevgerê ne net û ne êşkere bûn. Tiştên wisa danediqurtandin, zêde perveyî (reaksiyan) nîşan dida. Li hemberî tiştên wisa pir hasas û diltenik bû.

Li ba vê hisyarbûn û dûrbîniya xwe her gav bi moral bû. Moral dida heval û gelê xwe, li hemberî dijmin çavê xwe nedîşikandin, çavtirsî nedibû, xwêpaşandan û şewşbûn pê re tune bû. Van taybetiyên wî ew kiribû xwedî meşeke serbilind. Vê rewşa han, xwe di warê

tîkiliyên bi malbatî re jî dida xuyakirin. Tîkiliyên xwe û malbatê dianî asta şoresgerî. Xema malbatî li aliyekî dihişt. Ji rêzêbûn layiqî xwe nedidî; tenê ne bi berxwedana xwe dihat naskirin, ji bo ku xwe bi pêş bixe, bike kadro, bi cahda xwe bibe partîzanekî baş jî, dihat naskirin. Xwedî rêveçûn û hiseke mezin bû. Pêwendiyên wî yê bi hevalan re, bi şehîdan re pêwendiyên hîsî bûn. Mîna ku, bi kuştina Elî Tuzun yê ku bûbû sedemê şehîdbûna rêheval Cuma Tak, pir dilgeş bibû. Di zîndanê de piştî ku heval Heyri û Kemal şehîd bûn, ji bo çalakî bê ajotin pir fedekarî kir. Ji bo berxwedana rezberê, em dikarin bibêjin wê gavê bi rengekî bêrezkarî bi ser rêveberaya me de dihat, digot: "Eger hûn dest bi çalakiyê nekin, emê bi serê xwe dest pê bikin. Hewce nake em zêde bisekinin." Ev mînak ji bo ku taybetiyên wî yên berxwedanê bidin naskirin, her hal bes in. Di vê mijarê de xwedî qedr û rûmet bû. Ji ber van taybetiyên wî baweriyek mezin pê hebû. Ev jî xuya dike ku wesfên pêşengbûnê pê re hebûn.

Gava me bihîst ku Yılmaz gihîştîye partiyê, pir kêfa me hat û em dilgeş bûn. Em pir kêfxwaş bûn ku partiya me di şexsê wî de şervan û fermanarekî baş qezenc kiriye. Hêviyên me yê mezin jî hebûn. Bawerîya me bi peywendî û berxwedêriya wî hebû. Me digot 'pêvajoy wê tekoşînê pê bida fêmkirin, pîrsgirêkên ahangiyê çênabin û mutlaq wê xwe bigihîne merhaleyekê.'

Ew hevalekî birûmet ku partiya me bi salane di şexsê xwe da hewandibû, di demên dijwar re derbas bûbû, mirovekî bi ramanên me, bi armancên me ve girêdayî bû. Dema ku me bihîst ew bûye şehîd, em pir xemgîn bûn.

Gelek hevalan bi salan di zîdana da zilm dîtibûn, di navenda terorê û rehabilitasyonê de rêveberî kiribûn. Hêviyên me ji wan hebûn an ketin, an jî derketin derve bi saziyên dewletê re bûn yek, ji refê partiyê qetiyên li berjewendiyên xwe yên erzan nihêrîn. Beşek jî li navenda partiyê bûn pîrsgirek, gav neavêtin. Hinek jî bûn bela serê partiyê. Yılmaz, bersiva herî baş da wan. Jiyan Yılmaz ya ku mîna meratonêke dirêj, mîna şerîta filmekî zû derbas be tî-ne pêş çavê mirov, xurtbûna pêwendiyên wî yên bi partiyê bi tîkoşînê û gel re dide xuyakirin.

Daxwaza şehîd ya bîngehîn afirandina "mîrovahiya nû" ye. Ev jî di pêwendiya bi serokatîyê, partiyê û gel re derbas dibe.

10 kewçêr 1996 hovîf hate protestokirin

Hamdulah Şengüler, ji bo protestokirina qetlîama Girtîgeha Amedê, li Girtîgeha Bayrampaşayê ya Stenbolê xwe şewitand. Di 23'ê rezbera 1996'an de hêzên dewletê ku ji tîmên taybet, endamên JITEM'ê û nîrafkaran pêk dihatin, li Girtîgeha Amedê êriş birin ser girtiyên azadiyê û di êrişê de girtiyên bi navê Mehmet Aslan, Erkan Perişan, Kemal Çam, Rıdvan Bulut, Hakkı Tekin, Edip Direkçi, A.Sabri Gümüş, Ahmet Çelik, Nimet Çakmak û Kadri Demir bi awayekî hovane kuştin. Beriya ku Hamdullah Şengüler xwe bişewitîne bi 12 rojan, Vedat Aydemir jî ji bo protestokirinê xwe şewitandibû.

BÛYERINE JI DÎROKÊ



11 Kewçêr 1993 Li Edeneyê şaxa NÇM'ê vebû

Navenda Çanda Mezopotamya, piştî navenda li Stenbolê û şaxa Amedê, li Edeneyê jî şaxa xwe vekir. Ji hêla hêzên dewletê ve piştî NÇM'ya Amedê êrişên herî tund û zêde li ser NÇM'ya Edeneyê hatin dîtin. Teatra Yekbûn, Koma Rewşen (muzîk), Koma Raperîn (folklor), Koma Semahê, Şitlên Azadî (koroya zarokan), Koma Zilan hwd. di nava NÇM'a Edeneyê xebatên xwe dikin. Her wiha di warê lêkolîn û helbestan de 2 beş ava bûne. NÇM'a Edeneyê hefteyê rojek di "Radyoya Arkadaş" de bernameyên ku şexsiyetên kurd didine nasandin, çêdike.

AWIR

Mektup

Di film de bavê wî çepgir e, lê rengê çepgiriya wî ne diyar e. Di vir de derhêner mimkûn e ku sansûr aniyê, çiroka mirovekî çepgir bi fantazyê ve tevli hev kirine.



Derhêner: Ali Özgentürk
Listikvan: Tarık Akan,
Zişan Uğurlu Cüneyt Gökçer

Derhêneriya filmê "Mektup" ango Name Ali Özgentürk kiriye. Rolên sereke hunermendê bi navûdeng Tarık Akan û Zişan Uğurluyê girtine ser xwe. Piştî navbereke dirêj Tarık Akan bi navê Mektup derdikeve pêşiya temaşevanan.

Bi rastî çiroka film ne diyar e. Sê çar mijar di film de hene. Yek ji wan Tarık Akan (Ragıp) li bavê xwe digere. Gava li bavê xwe digere dilê wî dikeve keçikekê.

Di film de qala çepgiriya tê kirin. Li ser vê mijarê film saz bûye. Ragıp zilamekî dewlemend e, bavê wî jî di film de wekî çepgir tê xuyakirin.

Ragıp ji Amerikayê tê Tirkîyeyê, diçe cem hevalên bavê xwe, hin agahiyan jî wan distîne. Jixwe di dema stendina agahiyan de qala siyaseta dibe.

Her wiha piştî ku Ragıp bi şer cihê bavê xwe nameyekê dinivîse û bi şeweyekî nediyar dimire.

Bi rastî ev film filmekî gelekî ji rêzê ye. Di film de hest xuya nake. Tecrûbeyê bi salan ya Tarık Akan bi vî filmî têkçûyî xuya dike. Di vir de xala herî girîng ew ku naveroka film li ser çepgiriya hatiye

sazkirin.

Tarık Akan ku mirovekî demokrat tê nasîn, di vî filmî de ji vî taybetiya xwe dûr e. Di film de bavê wî çepgir e, lê rengê çepgiriya wî ne diyar e. Di vir de derhêner mimkûn e ku sansûr aniyê, çiroka mirovekî çepgir bi fantazyê ve tevli hev kirine.

Çepgirî bi awayekî ketî û têkçûyî tê ravekirin. Ji hin bûyeran behs dike, lê ew bûyer jî aliyê tu kesî ve nayên fêmkirin. Yanî çepgirî li ser xeyalê hatiye sazkirin.

Di film de qasê çepgirî heye.


Mirov nikare bibêje, ew li ser mijareke dîrokî radiweste, lewre bi tu awayî atmosfera vî demê dernakeve holê. Ji bilî vî yekê di film de karakter jî gelekî xerab hatine bikaranîn. Ne Tarık Akan, ne jî Zişan Uğurlu di rolên xwe de bi ser neketine. Wekî ku du zarok li hemberî kamerayê rawestiyabin û bi hev re henekan dikin, tê xuyan.

Piştî film xelas bû, madê temaşevanan tirs bû û dengên wekî "me saet û nîva xwe bêsedem da vî filmî jî" dihatin.

A. ALTUN

ÇAVDÊRÎ

"Di nav livînan de nemrin"



MÎRHEM YÎĞÎT

Kesên ku Apê Osman Sebrî nas dikin û ew li mala wî ya li taxa kurdan li Şamê ziyaret kirine, dizanin ku raserî cihê ew tîm lê rûdinişt, miqabil devê derî li ser diwêr, afîşeke şehîdan hebû. Di nav nixên neteweyî û însanî de ji bo wî şehîd ewçendî mezin û pîroz bûn ku tîm li binya wan rûdinişt û di nav axaftin û di sohbetên xwe de tiştekî ku teqez digot, dianî bîra mirov, bala mirov dikşande ser, hebû. Ew jî wênayên di afîşê de bûn. Kalê di ser hefteyî re hinekî li ser milê xwe yê çepê dizivirî, serê xwe ber bi jêr de vedikir û bi destê çepê şehîd destnîşan dikirin û pêre jî digot: "Hun jî mîna wan bin, di nav livînan de nemrin. Mirina di nav livînan de bi mirovên şoreşger nakeve. Kesê ku difikire ji bo gel û welatê xwe tiştekî bike û ji bo vî kirinê cidî ye gerek ne di nav livînan de belê di nav xebatê de bimre. Her mirin jî ne mirin e. Mirin jî ji mirinê baştir heye!"

Apê Osman Sebrî di payiza sala 1993'yan de, 12'ê meha Kewçêrê serê xwe danî. Ji nav me barkir. Payîz demsaleke ku di xwe de şehîd bûna gelek mirovên mezin û wefata hejmarek şexsiyetên me yê navdar berhembêz dike. Mirov dikare navê çend pêşeng û qadroyên Partiya Karkerên Kurdistanê wek Xeyrî Durmuş, Kemal Pîr, Elî Çiçek û Akîf Yılmaz, Apê Musa Anter, parlamenterê HEP'ê Mehmet Sincar, ji kesên li sorgon û li xerîbiyan serê xwe danîne Yılmaz Güney, Cegerxwîn, Prof. Qenadê Kurdo û navê Osman Sebrî bide.

Min Apê Osman di du zemanên cihê de nas kir. Di nav van herdu zemanan de şeş sal hene. Cara ewil havîna sala 1978'an bû. Bi Kesra kurê mamoste hesen Hişyar re em çûn mala wî û em heta derengê şevê li cem wî man. Wê şevê Apo bi zêdeyî ji me re behsa xebatên tevgera rizgarîxwazî li Başûrê Biçûk, xîlaf û dijayiyên di nav partiyê de, "itham û bêbextiyên Selah Bedredîn" kirin. "Îro dibêje me Apo efû kiriye, Apo biwaze dikare bê nav partiyê. Ew kî ye ku min efû bike." Apo carna hêrs dibû, dengê wî berz dibû û destê xwe jî li masê dixist. "Ji min re digotin tu wekî Bismark e. Tu gelekî hişk e. Tiştên tu dixwazî em dê heta niha wiha ji hev ketî, perçe perçe mabûna? Wê rewşa me ne baştir bûya û em dê ne li çihêkî gelekî birûmetir bûna...?"

Cara duhem mehên dawî yê sala 1984'an û mehên ewil ji sala 1985'an bûn. Di vî zemanê navbiraw de ez 7-8 mehan li Başûrê Biçûk mam. Di vî navê de çend caran ji Qamişlo ez çûm Şamê. Li wir li mala hevalekî dimam. Heval bêj hema cîranê Apo bû. Di nav mala wî û ya Apo de 70-80 gav ya hebûn ya tunebûn. Têkiliyên mazûvanê min bi Apê Osman re gelekî xurt bûn carna dihukimî ku heftê ne carekê, belê du caran û belkî zêdetir serî li Apo dixistin. Ne her gav be jî carna ez jî bi wî û malbata wî re diçûm mala Apo. Ji van rojên bîmanê û binirx gelek tişt di bîra min de mane û ne mimkûn ez ji bîra bikim. Ev roj li ba min bi qedir in gelek hêja ne û xwediyê şopên kûr in. Li ser van rojan gelek tiştên mirov dikare bêje hene.

Di ser wefata Apê Osman Sebrî re çar sal derbas dibin. Heyfê ku heta niha li ser jiyana wî, şexsiyet û xizmetên wî hê çu lêkolîneke bisêrûber nehatiye kirin. Tiştê ku li ber destan heya çerçewa çend meqale û kitêbokeke biçûk ku ji aliyê Amed û Zîne hatiye amadekirin derbas nake.

Tiştê mirov dîlxweş dike û bêhna mirov derdixe ew e ku vî payîzê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê biryar girtiye ku bi navê Osman Sebrî xelatekê bela bike û ev xelat jî dê çend şaxên edebî bigre ber xwe.

Hunermend û sendîkavan Yusuf Çetin Sînemaya tirk jî sîstema tirk xitîm

Hûn helwesta sînemaya tirk a li hemberî gelê kurd çawa dinirxînin?

Ez dikarim bibêjim ku ji destpêka komarê heta îro ji hêla sîstem û rayedarên dewletê ve gelê kurd wekî gel nehatiye pejirandin. Ev helwest, piştaftineke tund bi xwe re tine. Ev yek di warê çand û hunerê de jî xwe nîşan dide. Belê gelek filmên ku xwedêgiravî jiyân, folklor û hêjahiyên kurdan tê de derbas dibin hatine çêkirin, lê mixabin mirov di wan de rastiya gelê kurd gelekî kêm dibîne. Mesela di filmê Reis Çelik "Işıklar sönmesin" û filmê Yavuz Turgul "Eşkiya" de kurd mîna maceraperest tene nîşandayin. Mînak: Di filmê "Işıklar Sönmesin" de şerê çekdarî çawa ku karekî beredayî be, tê nîşandayin. Cil û bergên gerîla mîna yê gundi-

yan, tewra leşkerên tirk gelek baş û însanî, lê tewra gerîlayên kurd bi awayekî hovane û ne mirovî tê nîşandayin. Tiştên bi vî rengî bêguman li gorî ehlaqê hunerê jî û li gorî ehlaqê mirovahiyê jî ne rast e.

Ji bo çi û ji bo kê sînema?

● Ji bo gel sînema, ji bo hunerê sînema. Lê di serî de ji bo mirovahiyê sînema.

Derhêner û senarîst Ahmet Soner, di hevpeyvîneke xwe de dibêje: "Divê sînemaya kurd bi zimanê kurdî, bi sermîyanê kurdan çêbin û divê listikvan jî kurd bin." Li gorî we şansê projeyêke wisa çiqas e?

● Belê bi rastî jî pêwîst e sînemaya kurd derkeve holê. Şans çiqas e? Ev jî bi piştgirî û nêzîktêdayîna gelê kurd ve girêdahî ye. Divê îro rastiya ku gelê kurd tê de ye; şer, aşî, qirkirin û windakirin, heta xerakirin û wêrankirina gundan jî divê bê pêşiya kamerayên. Astengî he ne, lê divê ew jî holê rabin. Îro gelê kurd hewce ye ku ne bi tenê li Tirkîyeyê bala raya giştî ya Ewrûpayê bikîşîne ser xwe, divê filman çêbike da ku gelên ewrûpî, li ser perdeya spî derd û keserên kurdan bibînin û jê dersan bigirin. Di vî warî de wekî sînemavan û hunermendekî kurd çî bar bikeve ser milên min, ez amade me.

*"Mem û Zîn"
"Kilamek ji bo*

Beko", "Siyabend û Xecê" gelek niqas: çî erênî çî jî neyînî hatin kirin li ser van filman. Dîtinên we li ser van filan çî ne?

● Hin kes rabûn û li ser hêjahiyên gelê kurd rûniştin û xwestin li ser navên kurdan tiştan biafirînin. Di van filman de bi tenê "Kilamek ji bo Beko" jî ber ku ew li derveyî sînorên Tirkîyeyê, li Ermenîstanê hatibû çêkirin, baş bû, lê ew qas. Me berê behsa filmê "Işıklar sönmesin" kir. Li gorî agahiyan artêşê jî piştgirî dabû wî filmî. Ew filmê ku jî artêşê piştgirî û alikariyê bigire, gelo wê çiqas rastiya kurdan bîne zimên? Ji bo filmê "Mem û Zîn" ez dikarim vê bibêjim; bê şik û guman Mem û Zîn klasîkeke edebî ye û pir hêja ye. Lewre filmê vê berhemê, diviyabû hejayî nav û dengê berhemê û nivîskarê wê bûya. Lê mixabin şahesera Xanî, di film de bûye, destaneke evîni...

Heta niha hûn, ji zêdetirî 700 filman de derketine hemberî temaşevanan. Gelo hûn herî zehf di bin bandora kîjan filmî de mane?

● Heta niha ez nikarim bibêjim ku min filmên baş çêkirine, tevî ku di 700 filman de min listiyê jî. Ango tiştên ku min dixwest bikim di wan filman de min bi dest nexist. Ji ber ku tu car têkiliyên vala û beredayî angû di bar û cihên din de têkiliyên me bi şexsiyetan re çênebûn, lewre jî rolên sereke bi dest min neketin. Her dem ez di asta figûranîyê de mam. Lewma ez dibêjim di warê sînemayê de min berhemên xurt nedan. Lê gelek caran min û hin hevalan me hewl da ku tiştên baş em biafirînin. Di salên 1995-1996'an de filmekî ku ez serlistikvan bûm, bi navê "Semer" tevî kêmasiyên derhêner û destnedana rewsa aborî, me çêkir. Di film de mijar jiyana barkêşekî kurd e, ku li Stenbolê jiyana xwe digel dijiwarîyan didomîne û hewl dide xwe ku barkêran bi rêxistin bike. Ev film çend caran di Kanal 6 yê de jî derket.

Tê gotin ku sînema "nankor" e...

● Gelek mirovên hunermend rojên fireh dibînin, pereyên zêde dikevin destên wan, di heman rojê de xerc dikin,

Îro rastiya gelê tirk, rastiya sîstemîyê, dibe sedemên çêkirina bin mijara filman. Tu car nayê genîbûna sîstemê filmek bê çêkirinê rah film tene çêkirin. Rewşa sînemayê de ye. Sînemaya tirk îro v

didin bar, pavyon û gazînoyan. Piştî demeke pîr dibin ku edî tu rol û girîngiya wan di nav sînemayê de namîne, wekî din di jiyana xwe de karekî din jî nekirine, dikevin rewsêke xerab, piştî re jî qareqar dikin û dibêjin: "Sînema nankor e..." Ev sextekarî ye.

Eger zimanê film bi kurdî be, finansor û listikvan kurd bin, coxrafya Kurdistan a n



*b e ;
gelo tere dîke
ku em bibêjin: "Ev film, filmê sînemaya kurd e"?*

● Bi awayekî fermî belê!... Lê belê ev yek jî heye; divê rastiya kurdan, li ber çavan bê girtin. Divê dîtin û nêrînen kurdan li hemberî cihanê derkeve holê. Divê di filmekî wiha de tore, zargotin û kevneşopîya kurd li ber çavan bê raxistin. Nexwe îro ku "qorîcî" yek angû şexsiyeteke paşverû çavên xwe ji hemû rastiyan kurdan re bigire, berjewendî û nîrxên gelê kurd nas neke û ew

Divê di filmê kurdan de rastiya bin. Di filmekî wiha de pêwîst e ber çavan bê raxistin. Naxweste teke paşverû ku berjewendî çiqas cil û bergên kurdan li xwe ku ewê filmê



Endamê GYK ya IHD'ê, hunermend Yusuf Çetin, di sala 1946'an de li gundê Yazıcı ya Agiriyê hatiye dinê. Di sala 1969'an de hatiye Stenbolê. Ev 25 sal e ku ji zêdetirî 700 filman de rolê figûranî listiyê. Beriya 12'yê îlonê kar û barê Sendîkavanî û rêveberiya Sîne-Senê kiriye. Niha jî Cigirê Serokê heman sendîkayayê û rayedarê NÇM'ê ye.

Çetin: wekî iye!

na tirk ku ji her awayî ve xi-
hên înfîxarî. Jiyanên kirêt di-
randin ku li ser xitimandin û
lê li ser evîna Musa û Sa-
naya tirk ji di vê merhelayê
kî sîstema tirk xitimiye.

çiqas cil û bergên kurdan jî li xwe bike
jî, ev nayê wê maneyê ku ew filmê kur-
dî ye.

Yılmaz Güney sînemaya şoreşger
derxistiyê astekê, di riya diyaletîkê de
meşiyaye û xwe gihandiyê nasnameye-
ke neteweyî. Hûn dikarin li ser van ali-
yên wî çî bibêjin?

● Ji derhêneriya wî bigi-
re, heta listîk-
v a n î



û se-
narîstiya wî

Yılmaz Güney hunermendekî
gelekî mezin e. Wî gelek gavên mezin
avêtine, bingeha sînemaya şoreşger
pêk aniyê, rastiya gelê kurdî gelek
berhemên wî yên mîna Rê (yol), Keşî
(sürü), Dîwar (Duvar) û hwd. de bi
aweyekî berbiçav (li gorî dema xwe) tê
dîtin.

Tu dikarî bibêjî ku "Sînemaya Tirkî-
yeyê" jî wî bi pêş ve biriye?

● Bêguman... rêberekî sînemaya
Tirkîyeyê bû. Ez nabêjim sînemaya

lê kurd li ber çavan bê gir-
re û kevneşopiya kurdan li
"qorîci" yek ango şexsiye-
irxên gelê kurd nas neke,
bîke jî, ew nayê wê maneyê
dî çêbîke.



Dimenek ji filmê "Sine-Sen" ku hunermend Yusuf Çetin tê de serlistikvan e.

tirk, dibêjim sînemaya Tirkîyeyê. Sîne-
maya çirokî li aliyekî hiştiye, dest avê-
tiye sînemaya rastiye. Wî ne ji bo ser-
destan, lê ji bo bindestan sînema çêkiri-
ye.

Bi giştî rawşa sînemaya tirk çawa
ye?

● Îro rastiya gelê tirk, rastiya sîste-
ma tirk ku ji her awayî ve xitimiye, di-
be sedemên çêkirina filmên înfîxarî. Ji-
yanên kirêt dibin mijara filman. Tu car
nayê fikrandin ku li ser xitimandin û
genîbûna sîstemê filmekê bê çêkirin, lê
li ser evîna Musa û Sarah film tene çê-
kirin. Rewşa sînemaya tirk jî di vê
merhelayê de ye. Sînemaya tirk îro
wekî sîstema tirk xitimiye.

Em werin ser kar û barên NÇM'ê di
warê sînemayê de.. Têkiliyên we bi sa-
ziyê re çawa ne?

● Gelek baş dibînim karê wan, he-
valên hêja ne. Her çiqas ez endamê rê-
veberiya NÇM'ê me jî lê em zehf hev
nabînin. Ez bawer im ku di pêşerojê de
NÇM wê gelek tiştên baş derxîne holê.
Îro gelek endamên sînema û tiyatroya
NÇM'ê endamê Sine-Sen ne. Gelek
car me bang li wan kiribû, bi riya we ez
dîsa bang li wan dikim ku werin û têki-
liyên xwe bi Sine-Senê re hîn xurtir bi-
kin.

Hûn hunermend, parêzvanê mafên
mirovên û hem jî sendikavan in. Gelo
hûn xwe nêzîkî kîjan warî dibînin?

● Beriya her tiştî ez parêzvanê mafên
mirovên im. Ji bo ku li vî welatî tiştên
qirêj kiryarên gemar ji holê rabin ez
têdikoşim. Lê ez her sê karan jî heta ku
ji min tê dixwazim bi rê ve bîhim.

Hûn vê gavê cigirê serokê Sine-Senê
ne. Di merhaleya îro de Sine-Sen di
nav şertên çawa de ye. Hûn di kîjan as-

tê de ne, di warê tiştê ku hûn dixwazin
bikin de?

● Ez dikarim vê bibêjim tiştên ku
me daye ber xwe heta niha me yek ji
wan jî nekiriye. Berê min gotibû ku di
nav sînemayê de sîstema reqabetê he-
ye, di nav Sine-Senê de jî, ev reqabetê
dîtin. Mixabin her kes li gorî berjewen-
diyên xwe têdikoşe.

Hûnê jî bo serokatiya Sine-Senê bi-
bîn berendam?

● Bêguman mirov mewziya xwe
terk bike, nebaş e. Ji ber ku li holê qa-
dekê têkoşinê heye, divê mirov wê de-
rê vala nehêle. Lewre jî ji bo serokatiya
giştî ezê bibim endam...

Di kongreya DİSK'ê de hûn bûn be-
rendamê serokatiya giştî, lê Rıdvan Bu-
dak dîsa hat hilbijartin. Hûn dikarin
analîzeke giştî li ser vê yekê bikin?

● Bi xebata çar-penc rojan, îrade-
yeke ku ji kesên şoreşger û welatparêz
pêk dihatin, me derxist holê û vê dele-
gasyonê li Stenbol û Enqereyê bi îmka-
nên kêr û qels amadekariya kongreyê
kir. Di kongreyê de me 36 deng girtin.
Bi rastî jî heta vê gavê di kongreyên
DİSK'ê de cara yekemîn bû ku muxa-
lefeteke wiha derket. Bêyî xebateke
xurt, em dikarin bibêjin ku xebata me
deng veda. Ji îro û pê ve emê di nav
sendikayên şoreşger, demokrat û we-
latparêz de bikevin nav xebatên baştir û
emê îtfakan pêk bînin. Mixabin beriya
kongreyê, me eleqeyê baş di nav
"çepgirên tirk" de nedît. ÖDP jî di nav
de, gelek hêzan di kongreyê de li cem
Rıdvan Budak xwestin cihên xwe tekûz
bikin. Li gorî çepgiriya xwe ketin nav
polîtîkayên teng. Bêguman pêwîst bû
ku ev her sê kom li hemberî Budak hê-
za xwe bikirina yek, lê mixabin ji ber
sedemên ku min got ev yek pêk nehat.

Tiştêkî din ji ber ku em nebûn yek, 30-
35 deng vala derketin.

Tê gotin ku tevkujiya li Taksîmê ya
di sala 1977'an de li ser sendikavan
bandoreke neyînî kiriye...

● Îro em nikarin bibêjin ku sendika-
vanî li Tirkîyeyê tê kirin. Nexwasim,
em vê yekê di DİSK'ê de qaşo ku nayê
şoreşgeriyê tê de derbas dibe, em qet
nabînin. Îro serok û berpirsên sendika-
yan, dikevin milên karbidestên ku xwî-
na karker û kedkaran dimijin. Sendika-
vanên qaşo îro gotina MGK'ê nake di-
do. Di 30 saliya DİSK'ê de me dît ku
îradeya karker û kedkaran ji bo Serok-
komar Süleyman Demirel û meclîsa
tirk re hatiye diyarî û pêşkêşkirin. Eger
îro hûn ne li cem kedkarên di grevan de
bin, eger îro hûn kedkaran nikaribin
derxinin kolan û qadan, hûn nikarin ji
xwe re bibêjin ku em sendikavaniyê di-
kin. Beriya salên 1980 yan dema me di-
got "Grev" jiyan disekîni, bi sed heza-
ran karker û kedkar derdiketin qad û
meydanan. Ji 500 hezarî zêdetir kes di
sala 1977'an de li Taksîmê civiyan.

Di nav ÎHD'yê de niha hûn çî kari
dikin? Li vî welatê rola ÎHD çî ye?

● ÎHD jî bo bicihbûna aştiyêke bi-
rûmet, jiholêrakirina îhlalan têdikoşe.
Bi heyeta "Trêna Muşa Anter re" em jî
çûn Amadê lê, me tiştên sosret û balkêş
dîtin. Bi dehazaran leşker û tim seran-
serê riyên Kurdistanê girtibûn. Li herê-
mê ranta şer derketiye holê, ranta firo-
tina çekan, sektora tekstîlê û ranta ero-
înê derketiye holê. Hêzên dewletê nax-
wezî şer raweste. Bêguman di vir de
rola ÎHD'ê derdikeve holê, rola aştiyê
derdikeve holê.

HEVPEYVÎN: SALIHÊ KEVIRBIRÎ

Helbestvan M. Bekiro:

“Em ji xwe dûr ketine!”



Mehemed Bekiro demeke dirêj li Ewrûpayê bi Dr. Ebdurehman Qasimlo re jiyaye. Ziviriye başûre Kurdistanê û li zanîngeha Silêmaniyê mamostefî kiriye. Bi çiyayê Kurdistanê ve hilkişiyayê. Berxwedan û têkoşîn kiriye.

bûn. Wan bîrhatinên biçûkanî, jê nedigeriyan, ew li pey xwe dikşandin..., ew dibirin û dianîn..., ew li kolanên Amûda şewitî, careke dî, vegerandin, danîn.

Stranên Cizîrê:

Ev berhevoka pêşîn e, ya Dr. Mehemed Bekiro di sala 1992'yan de bêtî ku navnîşana çapxanê, yan weşanxanê bi nav bike, ew çap kiriye. Berhevok ji 39 rûpelên biçûk pêk hatiye û 20 kurtehelbestên serbest di navêroka xwe de hilgirtine.

Bûka ber êvarê

Dr. Mehemed Bekiro ev berhevok ji sala 1996'an li Beyrûdê Libnanê, çap kiriye. Navê çapxanê nehatiye nivîsin. Ev berhevok jî, wekî ya dî, ji 20 helbestan, di 39 rûpelên biçûk de, saz bûye.

Diyar e ku ev her d u



“Stranên Cizîrê” û “Bûka ber êvarê”, du berhevok in, ji wan helbestên şîrîn balkêş in. Helbestvanê van her du berhevokan Dr. Mehemed Bekiro ye. Dr. Bekiro helbestvanekî pêjinker û hes-tenik e. Ew li bajarê Amûdê ji dayika xwe bûye. Xwendina xwe ya bilind li zanîngehên Ewrûpayê sergihayî (temam) kiriye. Demeke dirêj li Ewrûpayê bi Dr. Ebdurehman Qasimlo re jiyaye. Ziviriye başûre Kurdistanê û li Zanîngeha Silêmaniyê mamosteyî kiriye. Bi çiyayê Kurdistanê ve hilkişiyayê. Berxwedan û têkoşîn di ber bîr û baweriyên xwe de, di ber welat-parêziya xwe de kiriye. Piştî şerê 1979'an, di navbera rejîma Bexdayê û kurdan de, bêhêviyê sar xwe berdaye dilê wî. Mebest û armancên ku ji Ewrûpayê ew kişandin welêt, di çavên wî de biçûk bûn..., çilmisîn.

Helbestvanê me, bi reşbîneke bêpîvan (bêqeder), li paşeroja kurdîtiyê nêrî û bi dilekî bêbawerî xwest di riya hatinê re vegere. Bêhêviyê berê wî, dîsan, daye Ewrûpayê. Lê ne Ewrûpa û ne xemla wê, ne pêşketin û şaristaniya wê nekaribûn çu aramî û hêminiyê di dil û canê wî de bimînin.

Bîst sala ez li avahiyên dinyê geriyam, û çend xaniyên hilweşiyayî dihatin bîra min. Min bajarên pêşketî tev li hev xistin û çend kolanên teng û tarî, dihatin ber çavê min. Ez li wan vegeyiam..!

Ew xaniyên hilweşiyayî, ew kolanên teng û tarî, ku ji ber çavên wî nediketin, xanî û kolanên bajarekî wî bûn, dirûv û nîşandekên jingeha zarotiya wî ya bécir

berhevok gelekî biçûk in, lê gelekî jî rewan, germ û balkêş in. Digel ku naverokên helbestên wan hêsan û li rû ne jî, lê mirov dixwaze pirtirî carekê wan bixwîne. Tayekî zirav di navbera xwendevan û ramanên berhevokan de peyda dibe, wan bi hev ve girê dide. Bi bawerîya min, egerên şîrîniya helbestên Dr. Bekiro, ji du hêmanên bingehîn tèn:

1-Helbest, bi peyvîne gelêrî yên hêsan hatine ristîn. Rewşa van peyvînan, a serekî ew e ku bi haweyekî rojane, li ser zimanê gel digerin û bi vê yekê jî, pir şayik û nazdar bûne û wateyên wan jî bi şîranî hatine pêçan.

2-Helbestvanê berhevokan, wate û ramanên xwe, bi dilekî germ û hestekî rastego spartine bêjeyan û bi dilovaniyeke

bêrîdar, peyv û ramanên xwe bi hev ve girêdane û li hev pêçane.

Sala 1977'an û li Başûrê Kurdistanê jana gumanê û dudilîyê xwe ber dide dil û hînavê helbestvanê me. Di wê salê de şerê birakujî û hevdişî, li Kurdistanê serê xwe hilda û di wê salê de rejîma qirale Bexdayê, êrişên leşkerî, careke dî, birin ser Kurdistanê. Di wê salê de jî qonaxên hêviyên neteweyî, di can û derûnên mamosteyê Zanîngeha Silêmaniyê de hilweşiyên. Kurdan gund û bajarên xwe berdan û bi çiyên ve hilkişiyên. Helbestvanê me jî, yek ji wan kurdan bû ku xwe avêtin bextê çiyên. Li ber hîmekî, xemgîn diponije: Ramanek wî dibe... û gumanek wî tîne.

Li penaberdekî, di çiyê de rûnişt û giriya.

Dilê wî ji jiyane sar bû û rengê asîman

Xwezî wekî zarokêkî gundî, ez şivanê berxê te bama. Xwezî ez hebama, Xwezî ez hebama...!”

Helbestvanekî mîna M. Bekiro, ku bi dilê şikestî û hestê derizî, careke dî vedigere Ewrûpayê da ku jiyana penaberîya bêhêvî bijî; helbest dê konê bêbawerî û reşbîniyê, li ser wî bête vegirtin:

Devê dinyê li te hatiye hev, û dergehên asmana giş girtî ne. Tê hêviyê ji kê bikî? (kesî kesa nîn e) mal û malbat ji dest te çûn û her dû destên te vala ne. Tu bêheval û bêwelat Ev ne şunwârê bav û kala ne!”

Pişt re dîsa vegeyiam..., li hêlîna zarotiya xwe hêwirî, lê rûnişt, rabû geriya. Lê mixabin ne Amûdê hindêk aramî û tenahî berda dilê wî; ne jî dilê wî perwaz da û kelekvanîya xwe ji bîr kir... û rawestiya...!!

Tiştêk ji bizava kurdewarîyê nakeve serê wî, tiştêkî ji girov û behaneyên têkçûna hêviyên mezin jî, napejirine... Bêhêvîtiya bêsinor reşbîneke tarî, di dilê wî de meyandiye. Tiştêk nayê ber çavên wî, ji bilî dîrok û bîrhatinên dîrokî...! Lê kurd û kurdayetî...! Hiç çirûskê ronahî berçav nabe:

Em ji xwe dûr ketine, em bêxwe ne. Em hovê bîndestê hova ne. Zanê me nezan e Em mêrkujê berdestê mêrkujê ne.

Şîrîniya helbestên Bekro, ji hêsanî û rewanbêjiya wan tê, ji paşperdekirina raman û wateyên wan tê..., ji dilgermiya helbestvanê wan û rastegoya hestê wî tê...!

Xeyal û peyvbazî, di helbestên Dr. Mehemed de, kêr û rehetî ne. Berhevoka “Stranên Cizîrê”, ji hêla bêjeyan, bi şewazekî nêzî gelêrî hatiye nivîsin. Lê berhevoka “Bûka ber êvarê”, bi şewazekî sergihayîtir û tekûztir hatiye nivîsin.


Puxteya gotinê, helbestên Dr. M. Bekiro, nimûneyeke pêşketî pêngaveke balkêş e.

DEHAM EBDULFETTAH

Li NÇM'ya Stenbolê

- **12.10.1997 Yekşem:** Konsera Hozan Hogir
Hozan Hogir di sala 1995'an de di nav Koma Gulên xezan a NÇM'ê de dest bi xebatên xwe kir. Di sala 1996'an ji ji komê veqetiya, niha jî di nav NÇM'ê de hozantiyê dike.
- **15.10.1997 Çarşem:** Semîner, Sırrı Öztürk "Şoreşa kewçerê"
Şoreşa Kewçerê di cihanê de şoreşa herî bi bandor e. Di sala 1917'an de li Rûsyayê bi rêveberiya Lenîn şoreş pêk hatiye. Piştî jî Yekîtiya Komarên Sovyetê yê Sosyalîst hate îflankirin.

Çalakiyên vê hefteyê



Li BEKSAV'ê

- **11.10.1997 Şemî:** Film, Ekin "Kewçer" Derhêner: Sergei Eiseinstein- Grigani Alexandrav. Di vî filmî de li ser şoreşa sovyetê ya sala 1917'an tê rawestîn. Film, bi dimênên xwe yê li ser girseyaya gel balkêş e. Di film de gelek kesên ji gel wekî figûran cih digirin. Bi piranî dimên li cihê ku bûyer pêk hatiye, hatine kişandin.
- Li Jyanê kadîna kûltûrê û sanetê:** Pêşandana wêneyên Tekin Fırat. Tekin Fırat di sala 1982'yan de Zanîngeha Mîmar Sînan beşa bilind ya wênesaziyê xelas kiriyê. Li gelek cihên Tirkîyeyê pêşangeh vekirine.

AWIR

Çapemenî dîsa çû hawara artêşê

Wexta ku dewlet ji aliyê leşkerî ve li hemberî gerilayan tîk diçe, dest bi şerê derûnî (psîkolojîk) dike. Vê yekê jî bi riya rojname û telvîzyonên pêk tîne. Dewlet di hemû operasyonên ku li derveyî sînoran pêk tîne de îdia dike ku bi ser ketiye û di van operasyonan de îtirafkar û cahşên xwe yê sadiq jî ji bir nake.

Wisa xuya dike ku dewlet van rojan jî ketiye tengasiyê, dixwaze xwe bi rêzenivîsên îtirafkaran û cahşan derxe ser rûyê avê. Berî niha bi demeke kurt roja 5'ê kewçerê du rojnameyan xwestin ku barê serkaniya giştî sivik bikin. Di heman dema ku dagirkerên rû qermîçî dest bi operasyonên başûrê Kurdistanê kirin de, van her du rojnameyan ku xwe wekî çepgir didin nasîn; rojnameya



rûş ya ku ji avakirina komara tirk ku hetanî vêga derdikeve Cumhuriyet û rojnameya ku çepgirên ji dozêketî (dönek) dide xebitandin Radikal di heman rojê de dest bi rêzenivîsên xwe kirin. Rojnameya Radikal mijara "Nasıl İtirafçı oldular" rojnameya Cumhuriyet'ê jî "Güney Doğudan Öyküler".


Her wiha rêzenivîsa rojnameya Radikalê bi danasîna îtirafkaran xelas dibe, di nav wan danasînan de Cem Erseverê ku bi avakirina komên îtirafkaran tê nasîn di wê rêze nivîsê de cih girtibû. Di wê rojnameyê de tiştê rast jî derketibû, cahş û îtirafkar bi hev re diçin nêçira mirovan. Piştî ku dewlet baweriya xwe bi îtirafkaran tîne, wan dixwe nav cahşan. Tam jî cihê xwe ditîne. Ji bilî wê yekê her îti-

rafkarê ku danasîna wî kirine, wekî qehremanê esra bîstan hatiye nîşandayîn. Di rêzenivîsa Radikalê ya duyemîn de sernavekî li ser îtirafkar Hidayet Bozyiğit "Dağların Kralı Hido" hatiye avêtin. Di heman katê de jî çîroka jiyana wî; çî kiryê çî nekiryê hatiye nivîsîn. Rêzenivîs jixwe komîk e, meseleye hê komîktir jî li ser Hido hatiye nivîsîn. Li gorî rêzenivîsê piştî ku diya wî û xwişka wî tîne kuştin, ji ber wê yekê hêrs dibe û sonda mezin dixwe ji bo ku tola xwe hilîne, bi rastî jî wê rêzenivîsê, rêzefilmekî qehremanên ji dozêketî derdikeve!

Rojnameya Cumhuriyetê jî pirtûkeke subayekî ku li Kurdistanê tevî operasyonan bûye, sûd wergirtiye û ew rêzenivîs amade kiriyê. Di nivîsa yekemîn de Hakan Evrensel dibêje: "ji bo xwendina van çirokan wêrekî divê." Em di rêzenivîsê de li tiştêkî bi vî rengî ku, me bitirsîne an jî hin tiştên ku em bêjin balkêş e, rast nehatin. Her wiha gava mirov wê rêzenivîsê dixwîne bêhtirîn tê digihîje ku tîmekî taybet rahîştîye pênûsê û ew nivîsandiyê. Belê tiştêkî li gorî me di wê rêzenivîsê de heye, jiyana wî subayê ku li Kurdistanê kar kiriyê, guheriyê. Di bin bandora jenosîda kurdan de maye û pirtûkeke bi sernavê "Güneydoğu Öyküleri" nivîsandiyê. Her wiha ev rêzenivîs jî paralelî wê operasyonên dawî ya li başûrê Kurdistanê ye. Di vir de armanc yek e, gava ku artêşa tirk di şer de tîk diçe, rojameyên wê digihîjin hewara wê û dest bi şerê derûnî dikin.

TÎŞK

Qirkerdena Pilemûriye



LERZAN JANDÎL

Serra 1930'îroka ma de serêde qirkerdena, talanî, koçkerdena, zor û zordarî ya. 1930 de şarê ma zaf derd û kulî di, zaf kişiyayî, dewê ma, çê ma, bonê ma kerdî xirab, heywanê ma telef kerdî, malê ma ebi zor ma dest ra guret. Sebê naye jî gê heq waştina şarê ma, gê kêfê memûrêde, leşkerêde dewlete bî. Gegane jî qe sebêde verçim çinê bî. Sebê teyna biyena kurdan bi xo biye. Nînan ra yew qerkerdenê êde "bêsebebe" koledaran Pilemuriye de viraşte.

Roja 18.09.1930 de Fevzî Çakmak êno Erzîngan û naca ra wezaretê zerî re yew rapore ruşneno. F. Çakmak na rapore de nê çiya vano:

1-...mi di, ke ganî ders û cezaya dewanê Aşkîrîke, Gurke, daxbeye û Xaryîye bidiyo ci. Çimke nê dewî sebêde xirabkerdana aşayîşê nê cayî yê. Ez hênî û bawariye de ra, ke sebeta ke tesîrê dewlete reyna bêro viraştene û dersêde rinde bêro dewanê kurdanê (kürt köylerine) ke biyê risya (şimark) ganî yew qita hewayî bêro Erzîngan, û nê dewa bikero xirabe.

2-Erzîngan miyande 10.000 hezarî kurdî estê. Nê alevîtiye ra îstîfade kenê û wazenê, ke dewanê tirk bikerê kurd û zonê (ziwanê) kurdan bikerê vila. Tera mi a wa, ke çend sere ra tepiya kurdiye Erzînganî pêro kena bindestê xo. Dewê ke esas tirk ê, la belê alevî ye, hênî zên kenê, ke alevîtiye kurdî ya û seba naye jî zonê maya xo (tirkî) terk kenê û kurdî qese kenê. Serê nê karî jî kurdê Rusaray, Mîtinî, Şincaxiyê ke hetê her eşqiyatiye kenê, wê. Ganî dewê Kellarîkî bêre qeydkerdene û her çiyê ke luzum kenê, birûşnê Trakya û sero kê ke naca rê, miyanê şaristana de nezaretê polîstê bêre mecbûrê ronîştene kerdene. Sebeta ke dewê alevîyê ke tirk ê, kurdî qesê mekerê û ziwane tirkî naca vila bo, ganî tedbirê taybetî bêre guretene.

3- Êno zanayena, ke nê şarîstanî de tayê memurî irqe kurdî ra yê. Mesala: Hakimê Erzînganî Şevkî Efendiyê Pilemuriye kurda şevknenê û ebi şewe çeyanê dînan de benê kom...

4-Na meselaya ke mi arz kerd de, muhîmîeriye dersadayena dewanê ke mi madê yewîne de arde re zon û cara guretana memuranê ke, ênê zanitene ku irqê kurdî ra yê. Ez arz û teklîf kena ke wa hukmat qerarê çaran bicêro (bigêro). Naye ser ro roja 08.10.1930 İsmet İnönü Serleşkeriye re yew nivîs ruşneno û vano: "...pewîstiya xirabkerdane dewanê ke şima vatî bî, ama diyene".

Roja 20.10.1930 de filoyê firokanê tirk rojavayê Dêrsîmî şer ro firenê. Dewê Balabana, Lola Abasan, Heyderena, Dekan "kamilen" ênê xirabkerdene û mordemê dîne ênê qirkendene.

Gonîwerî hênî xedar biyê; qirkerdena, talan hênî bêhemd biyo, ke Konsolosê İngîlîzan yê Trabzonî Mattheews mesajê ruşneno Elçî Clerk re û vano: "Ez pê hesiyane, ke tirk kurdanê Dêrsîmî ser ro zê operasyonê ke hemverê armeniyên kerdo, kenê."

Ma guna şarê nê dewanê Pilemûre çik bî: Erzîngan de 10.000 î kurdî bî. Kurdê Erzînganî alevî bî. Aleviyên hetê kurdan kerdo, ziwane dînan qese kerdo, ke na hetkariye Koçgîrî de jî biya. Ma ewroj se biyo? Ewroj jî zê vîzêrî yo. Koledarî her hetê welatê ma kerdo gola gonî. Kal, pîr, cênî, çenek, mordem, heywan her ke hedefê terorê koledaran o. Dew, bir, bon û koyê welatê ma hedefê bombayanê koledaran o.

Çiyê ke ewroj vuriyo, o jî kurde ê. Kurdî, kurdê vîzêrî niyê. Ganî koledarî êndî naye fam bikerê...

Ma qey wê dinya xira bibe

Sal çend sal di ser xelê re derbas bûbû. Hîn mirov nû bi ser xwe ve hatibûn. Dewsa strîzerkê bilxur, şorbe; dewsa nanê garisî nanê cehinî û genimî girtibû. Ew rûyên zer û qermiçî hêdî hêdî vedibûn û xwîn ketibûyê. Rûyên zarokan ji birînan paqij bûbû.

Çi zor bû ew salên xelê. Xwedayê alemê gel îmtihan kiribû dîsa. Gotibû heke hûn ji riya min derkevin, ezê ji we birçî bihêlim. Wekî ya xwe jî kiribû û ew mirovên ku wî xuliqandibûn, dîsa qey ji riya wî derketibûn. Wî jî ew ji tahmên xwe bêpar, parîşan û birçî, tazî hiştibûn.

Piştî ku xela xelas bû û baran hat, gel ji bo ku careke din xelê nebînin, li erd û fereza pêledar bûbû. Yê genim yê ceh û nîsk diçandin; mêr, jin, xort û keç bi roj û şev dixebitîn. Lê yê bi taybetî tahde diditîn, dîsa jin bûn li vê herêmê; jinên kurd bûn.

Emîne yek ji van jinan bû. Bavê wê ew berdêlî dabû Evdal. Mixabin wê ne Evdal nas dikir û ne zanibû yekî çawa ye. Di xewnê şevan de jî nedîtibû. Tenê bavê wê ji diya wê re dibêje: "Emê qîza xwe bidine Evdalê Mala Kaliko û emê qîza wan Gulê jî ji lawê xwe Omer re binin."

Rojekê di tariya şevê de diya wê jê re dibêje: "Keçê emê te bidine yekî kufraqî."

Ma Emînê wê çawa bibêje: "Na." ? Qey hedê wê ye ku li hemberî orf û edetan derkeve? Tu mafê wê yî nabûnê tunebû. Ji zarokatiya xwe û heta ciwaniya xwe, qet li hemberî biryara dê û bavên xwe û mezinên malê derneketibû.

Zarokiya wê li ber berxan û karikan û nahtoriya rez û bîstanan derbas bûbû. Qet ji zarokiyê tiştek fêm nekiribû. Ciwaniya wê jî bi karên malê derbas bûbû. Mil bi mil bi diya xwe re şixre, gêre, palî kiribû. Kar û suxreyên pez, dewar û rezan kiribû. Hetanî dem hat bêyî vîna wan mirazê wê û Evdal bi hev re çêbû.

Dema ciwan bû gel jê re digot: "Qîza Dawid" û dema zewicî jî, jê re digotin: "Pîreka Evdal". Vê yekê jî ew pir diqehirand. Digot: "Çawa, ma qey ez ne mirov im, kesek balê nakişîne ser min. Kesek navê min nabêje?"

Ne şinek bû, bi derewa, nizanibû xwe li ber mirovan şîrîn bike. Jintiya wê hinekî xweşpeyv û şinek bû. Ji ber wê yekê jî malbatê rûmeta jintiya wê di ser wê re digirtin. Dema dinihêrî qedrê wê kêm e, girê wê çêdibû û pir dixeydî. Bi mêrê xwe re tim û tim şer dikir û diçû mala bavê xwe.

Dema ew mêrê xwe pev diçûn, digot: "Çima hûn vê pîrekê di ser min re digirin. Hûn hemû kesî ji min çêtir dibînin. Ma qey hûn nabînin ev karên ez dikim? Ez ji hemû pîrekên malbatê bêhtir kar dikim. Ji bo çî hûn jintiya min di ser min



re digirin?"

Mêrê wê ew fêm dikir. Lê belê di hundirê xwe de digot: "Dinya me wiha ye. Gerek e mirov rûmetê nede jina xwe. Heke ez rûmetê bidim jina xwe û bi ya wê bikim, wê gel hemû bi min bikenin û wê qerfên xwe bi min bikin. Wê demê jî ez nikarim di nava gel re binîherim." Dema Xelê jî pir pêkûti û tahde ditibû û dema xela xelas bû, dîsa pêkûti dom dikir. Di xelê de geh nikaribûn biçûna çîna qizwanan. Lê dem hat û xela xelas bû, dîsa hevdana qizwana hat û li ber derî sekinî. Mirovên gund dîsa amedekariya çûna qizwanan dikirin.

Rojekê şevaqê karwan ji nava gund derketin û berê xwe dane cihê qizwanan. Wê her yek barek qizwan binin û ji bo paqijiyê bikine sabûn.

Emîne jî bi karwên re bi rê ket. Lê belê kurê xwe yê şîrîn li malê hiştibû. Hetanî here û were wê çawa bike? Di civa-ka wan de jî, pîrek darên şikestibûn. Biryar her tim di destê zilaman de bû.

Mêrê Emîne jî wê demê çûbû leşkeriyê. Xezûrê wê carekê tenê jê re gotibû: "Here". Wê ji nikaribû bigota na. Digot: "Heke Evdal li malê bûya miheqq nedihîst ez herim."

Karwanê wan nêzikî 50 kesî bû. Nivî pirtirê wan jin bûn. Bi rê de tim hişê Emîneyê li mal bû, kurê wê Şekrê helawê (hingî li ber dilê wê şîrîn bû navê wî kiribû Şekrê helawê) li malê mabû û nexweş bû jî. Vê yekê jî hesreta wê zêde

dikir. Zaroka wê ya yekem qîz bû û di pênc saliya xwe de ketibû teştî şîrê kelandî û miribû. Ew hîn ji bîra wê neçûbû, îcar nexweşiya Şekrê helawê çêbû. Ew qet ji bîra wê nedîçû.

Du roj û şevêkê bi rê de çûn, hetanî gihîştin cihê qizwanan. Bi êvarê re karwan li nava qizwanan sekinîn. Berî hevdanê cîhekî bêhnvedanê ji xwe re çêkirin. Bêhnêkê rûniştin û xwarina ku bi xwe re anibûn derxistin. Nanê qarşux (yê genim û ceh) û rûnê nîvîşk û dims tevli hev kirin û xwarin.

Ji bo ku zû vegevin bi lez û bez dest bi hevdanê kirin. Zilam diçûn ser daran û bi rotên çêkirî qizwan diweşandin, qîz û pîrekan jî li jêr didane hev û din.

Emîne li aliyekî bi hemû hêza xwe qizwan didane hev û din li aliyekî jî Şekrê helawê di hişê xwe re derbas dikir, digot: "Gelo wê jintiya min çawa li kurê min binêre, wê çawa xweditiyê lê bike?"

Lê belê jintiya wê jî ji kurê wê hez dikir. Ji ber ku lawên wê çenedibû, tenê sê qîzên wê hebûn. Lewma ji lawan hez dikir. Lê belê dîsa dilê Emînê nedî cih de bû.

Wê şevê hetanî sibehê carinan qizwan didane hev û dû û carinan jî radizan. Lê dema tav derket hîn zor dane xwe û hetanî nîvroj qizwanên xwe dane hev û dû. Barên xwe li ser kerên xwe şidandin û berê xwe dane gundê xwe.

Emîne digot qey ew ji wî serê dinyê çûne seriyê din. Wekî jinên kurd Emînê

ji di bin qêkûtiyê de nala nala wê bû. Ne xwendina wê hebû û ne dinya jî du sê gundan pê ve ditibû. Digot qey dinya ji van du sê gundan pêk-tê. Tenê dema zilam ji leşkeriyê dihatin wê demê navê Stenbol, Enqere û Gelibolû dibihîstin. Lê digot qey ew deverana ji nêzikin û ew der jî wekî vê derêye û pîrekên wê derê jî wekî mene. Wekî din nizanî bû dinya bi çî awayî ye.

Bi wê betilbûna xwe dîsa peyatî bi rê ketibûn. Dema hatinê kerên wan vala bûn, carinan li kerên xwe siwar dibûn, lê îjar bar li ser keran bû û ewjî ji mecbûrî bi rê diçûn.

Jin bi hev re mêr jî bi hev re birê diçûn. Her du sê heb ketibûn galegalê. Pîrekan ji xwe re behsa xelê, leşkeriyê û karên xwe dikirin. Şev reş bi ser wan de hatibû, êdî hew reşên wan ji hevûdin xuya dibû. Carinan bêdengî dikete nava wan, carinan jî dengê kenê pîrekan û dengê çirçirkan ew tariya şevê dibirî. Ew yek jî ji wan re dibû melodî. Li ber hemû tahde û pêkûtiyê dîsa bi kêf û henek bûn.

Roja din êvarî nêzikî li gundê xwe kirin. Zilaman ji kêfa kilam digotin, pîrekan jî dilîrandin. Lê belê Emînê bala xwe tim dida gund û digot hela bê tu tevger di nava gund heye an na. Heke tevger hebûya wê hinek mirî hebûna. Ew yek jî belkî kurê wê bûya. Lê tu tevger tunebû.

Dema nêzikî li gund kirin, jinek ji ber perê gund derket û ber bi wan hat. Emînê zû xwe gihande wê û got: "Gelo kurê min çawa ye, haya te jê heye an na?" Jînikê got: "Erê.. erê wele haya min jê heye û baş e. Aniha bi emojina xwe re çû nava rez û hat."

Bi wê peyvê re pir kêfa wê hat. Sivi-kahiyekê girt ser laşê wê û baskên wê hebûna û wê bifiriya. Birçibûn, tahde û betilbûn êdî nedihate birê. Digot: "Tew kurê min rehet bûye û çûye nava rez. Gelo xwedêyo min çî ji te re kiribû? Te ev roja xweş rê min da. Ez hezar carî bi qurbana te bim."

Dema çûn nava gund li kêfxweşiyê din rast hat. Jintiya wê got: "Lê lê Emînê Evdal destûra xwe standiye, wê were malê, a niha nameya wî hat."

Hin ew peyv baş fêm nekiribû Şekrê helawê xwe avête hembêza wê. Emînê nizanibû wê êdî çî bike. Hema lawê xwe hembez kir û ne carekê, ne du caran; deh caran, bîst caran maçî kir.

Digot: "Xwedêyo, Xwedêyoo!.. Ma min çî ji te re kiribû te ev şadbûna rêya min da?"

Bêhnêkê ew û kurê xwe hembêzkirî man û tim di ber xwe de digot:

"Xwedêyo, ma bila em tim wiha şad bin, ma wê çibibe hi, wê çî bibe? Ma qey wê dinya xêra bibe?"

Gaveke girîng "Xaltîka Zeyno"

V an demên dawî di nivîskariya kurdî de pir tişt guherîn, ne wekî berê êdî nivîskar hew kurteçîrok û nivîsên bîranînî dinivîsin û çap dikin. Roman têne nivîsandin, ne ku romanên wisa biçûk in, ji çarsed rûpeli dest pê dikin heta şesed rûpeli. Li gorî pîvanên romanê, bi kurdî roman nivîsandin bi rastî jî tiştêkî pir dijwar e. Her wiha rexnegirên tirk jî îdia dikin ku zimanê tirkî teng e, ji ber wê roman hindik têne nivîsandin û wekî tê zanîn roman jî ne xasî Rojhilada Navîn e. Ji ber wê yekê jî kesê ku romanê dinivîsîne divê qet nebe hin pîvanan li ber çav bigire ku bi berhema xwe bikaribe tiştêkî bide xwendevanan. Ango zimanê kurdî jî ev demeke kurt e ku derbasî jiyana nivîsandinê bûye.

Romaneke ku bi zimanê kurdî ji aliyê nivîskarê Azadiya Welat Medenî Ferho ve bi navê "Xaltîka Zeyno" hatiye nivîsîn û ji aliyê Weşanxaneyê Dozê ve hatiye çapkirin, kete nav refên pirtûkxaneyê kurdî. Romanê navê xwe ji qehremana romanê "Xaltîka Zeyno" girtiye. Nivîskar bûyereke ku di serê Xaltîka Zeyno re boriye, nivîsandiye. Temaya ku nivîskar daye romanê bi ramanan, folklor û çîrokên gelêrî bi cureyekî xemilandiye. Nivîskar dema ku tasfîr kirine li pey hev peyvinên hemwate û qalibên wekî hev bi kar anîne. Bi caran tiştêkî hatiye tasvîrkirin, dûv re mijara ku hê encama wê kifş nebûye bi mijareke din ve hatiye girêdan. Di hin cihan de raman, ramanên nivîskar in an ramanên qehremana romanê ne jî ne kifş e. Bi giştî giranbûna ziman û forma romanê, awayên tasvîran rê nade ku mirov ji bûyerê tamekê bistîne û vî awayî xwendina romanê jî pir dijwar kiriyê.

Mijara ku nivîskar hildaye dest pir mijareke girîng û heja ye. Ev mijar bi awayekî pir alî û bi berfirehî hem ji aliyê civakî ve hem ji aliyê dîrokî û folklorîkî ve hatiye nivîsandin, divê bê xwendin û nirxandin. Roman ji aliyê peyvên kurdî ve jî pir dewlemend e, lê mixabin ev peyv li her derê Kurdistanê nayêne heman wateyê û ne jî pir kes jê fêhm dîke, tengasiya herî girîng jî di vî warî de der-tê.

Navnîşana xwestinê:

Weşanxaneyê DOZ. Beledîye cad. Vural Arıkan Apt. No: 5/6 Tünel İstanbul/ Tel: (0212) 24541 37

M. AKSOY




Deng û awazeke gelêrî: Xelîl Xemgîn

Bi xurtbûna saziyên neteweyî re, hesreta kurdan a ji bo hin tiştan ji holê radibe û mirovê kurd mecbûrî "korsanên nîrxên" kurdî namînin. Hevkariya NÇM'ê û Kom Muzîk Yapım, dibe sedem ku dengê hunermendên me yên li derveyî welêt, bigihêje gel. Bi vê yekê re jî, rê li ber bazirganên nîrxên neteweyî tê girtin.

Hunermend Xelîl Xemgîn, yek ji navdartirîn, hunermendên li derveyî welêt e. Gel wî ji kasetên ku bi riyên nehênîbi dest xistibûn û ji MED-TV baş nas dîke. Kaseta wî ya nû "Name" di bin berpirsiya Navenda Çanda Mezopotamyayê de ji hêla "Kom Muzîk Yapım" ve hate tomarkirin. Berhemên ku di kasetê de cih girtine hem bi gotinên xwe û hem jî bi awazên xwe gelêrî ne. Ne ku hemû stran gelêrî ne, awazên ku ji hêla hunermend bi xwe ve hatine çêkirin jî, ji rengê stranên gelêrî ne dîr in. Her wiha tevî ku di kasetê de gotinên hinek berhemên ji hêla hunermend ve hatine çêkirin û hinek jî helbestên kesên din in jî, bi zimanê gelêrî hatine nivîsin. Amûrên ku di kasetê de hatine bikaranîn jî wiha ne. Amûrên mîna saz û ney, keman, sazê selpe, mey û zurne, qanûn, def û erbane û ûd hatine bikaranîn.

Divê bê gotin ku gelêrbûn stranan ji nûjenî û şoresgeriyê dîr naxe. Di piraniya berhemên di kasetê de evîna welêt û doza azadiyê heye. Di nava kasetê de ji bilî du helbestên Cîgerxwîn, sê stranên gelêrî jî cih girtine. Bi taybetî strana "Delal" bi awaza xwe, strana "Hebe û lebe" bi gotinên xwe balkêş e. Ji bilî wan stranan, berhemên bi navê "Rista Şehîd" û "Name" jî balê dikişînin ser xwe. Strana "Rista Şehîd" li ser şehîd Huseyin Çelebî û "Name" jî ji bo Zîlanê hatiye nivîsin.



SERWÎSA ÇANDÊ

Cîhana nû di xemla kurdî de

MEDENÎ FERHO



S edema xeletî û şaşiyên viyan e û bi tîgî-hîştin û hişmendiyê ve girêdayî ye. Hege şaşî û xeletî di jiyana mirov de, di jiyana civakê de nebin xelet û mîna şelîpanê dîrdîrêjî hevûdin nebin, bêguman nexweşiyek bi birîn û tîrkêm (lê, nê, zûxav) heye ku jê re derkirin, piştê jî derman kirinê divê. Dema Spînoza mijara şaşî û xeletiyên danî ber xwe û di encameke zanyarî de li ser pîrsgirêkê rawestîya, îdeolojiya Althusser jî xwe re kire bingeh. Lê ku em li Gramscî dinêrin, berî Althusser li ser vê dabaşê rawestiyayê û bûye bingeha ramyariya wî. Zemîn her dem ji bo her nûjeniyê amade ye. Kevnarî bingeha nûjeniyê ye, lê her nûjenî di nava pêçanek hemdemî de xwe diyar dîke.

Gava em dêhna xwe didine sedsala 18'an, ku demjiyana ronahî û fîlozofî ye û bandora xwe bi giştî li ser cîhanê kiriye jî, li ser bingeha

ha kevn ava bûye. Ev mirovên zanyar, ku bala xwe dane ser geşbûn û ronahîkirina mirovaniyê, cîhan di nava hewngirî û ramangiriyê neqam de hiştine, ji zanistiyên berî xwe sêde wergirtine. Buffon, deyndarê Leibnîz e... Montesquie deyndarê Malebranche... Tev jî deyndarê Aristoteles û Descartes in. Her çiqasî zanyarên vê demê, Descartes û Newton anîbin beramberî hevûdin û Newton dabin pêş jî, di encamê de sedemek din heye. Bi gotinekê tenê em dikarin bêjin netewe... Yan jî em dikarin li ser demjiyana klasisizmê rawestin, ku her mirovê hunermend, nivîskar, zanyar pêdivî bi fêrbûna, çar, pênc, şeş, heft zimanan didît. Ev pêdivî ji bo xwendina berhemên kevn bi zimanê nivîskar dihat. Yanî Aristoteles bi latînî bête xwendin sêdgirtinek mezin dide. Lê, hunermend, nivîskar û zanyarên fransî ev rewş guhartin û dest bi nivîsandina bi zimanê zîkmakî kirin. Berlen wergerandin, ramyarî û hişmendiyê xwe bi zimanê xwe nivîsin. Vê yekê fransî kire zimanê navneteweyî. Ne tenê ziman, ji çand û jiyana rojane bigirin heya hiş û ramanan cîhana Fransa bû mînak.

Çima gelo?

Îro, teknolojiya Ewrûpayê, ji her demê bêhtir neteweya Ewrûpayê diparêze. Her civak, her tiştî li goî hoy û mercên xwe, di kiras

û xeftanê netewa xwe de ava dîke. Civaka kurdan di qonaxêkê pir nazenîn î korîk de ye. Lê nivîskar, hunermend û zanyarên kurdan jî di wateyêkê pir lawaz û misrî de ne.

Dijmin, dev ji her karûbarî berdaye, li ser tîkbirin û jîholêrakirina kurdan radiweste. Ji bilî hêrîşên leşkerî, hêrîşên medyayê jî, bê atlayî û bi dijwarî li dar dixê.

Em çi dikin? Medya kurdan çi dîke?

Medya, di nava civaka modern de, mîsyona politîkayê, bê guhartin girtiye ser milên xwe û di encameke postmodernî de dimeşîne. Medya kurdan jî, bûye beralîk û pîne û rîqayê devê dergeh û derqîtkê cîhana dijminan.

Kurd ji cîhanê ne der in, ku mîna her kesî, her tiştê xwe û her gavavêtinên xwe, mîna me li jor mînakên balkêş dan, li ser neteweya kurdî ava bikin. Da ku civaka me, bi sazî, bi dezgeh, bi medya, bi huner, bi çand, mîna xelkên cîhanê bibe xwedî paye. Cest û ezayên laşê civaka kurd pêdiviya vê çendê dibîne. Her gav, ji paşnavên nivîskaran bigirin heya bigihêje jûriya hilbijartina çîrok, helbest û romanên, divê ku avakirina hestên neteweyî bide ber xwe. Em jî, mîna her kesî cîhanê nû li ser cîhanek kevn, bi berdelek pir mezin ava dikin û pêwîst e ku em bi kiras û xeftanê kurdî bejna cîhana nû bixemilînin.

Behlûlê dîn û diziya pîvazan

Dema ku mirov li rewşa dewletê û bûyera tera-fîqa li navçeya Susurlukê mêze dike, Behlûlê dîn û diziya pîvazan tê bîra mirov.

Rojekê Behlûlê dîn tûrê xwe diavêje milê xwe û berê xwe di-de diziya pîvazan. Ew diçe nav zeviya pîvazan û dest bi hilkirina pîvazan dike û dixê tûrê xwe.

Di wê demê de xwediyê pîvazan jî, berê xwe dide nava zeviya xwe. Dinêre Behlûlê dîn, di nav zeviya wî de ye. Xwediyê pîvazan jî Behlûl dipirse: "Tu li vir çi dikî?" Behlûl bersivê dide: "Welehî ba ez avêtime vê deverê." Xwediyê pîvazan "Te çima destê xwa avêtiye baqê pîvazê?" Behlûl dibêje: "Ji bo ku ba min neavêje devereke din, min xwe bi baqê pîvazê girtiye." Xwediyê zeviye: "Baş e, lê ew çi ye di tûrê te de?" Îcar Behlûl dibêje: "Jixwe ez jî li wan mame heyirî û tûr îşê min xira kiriye."

Îcar mesela bûyera trafîqa ku li Susurlukê çêbûyî jî mîna mesela Behlûlê dîn û diziya pîvazan e. Ji ber ku ji dewletê tê pirsîn: "Kê ew her sê mirovên

hanê anîne bal hev (yek şefê polisan, yek jî endamê meclîsa tirkan, yê din jî hem qaçaxê dewletê, hem jî zilamê mafyayê ye)" Dewlet dibêje: "Na tu kesî ew neanîne bal hev, ew hev jî nas nakin. Hatina wan a ba hev tesadûfî ye, ew jî ne zilamê mafyayê ye." Tê pirsîn: "Lê ew çi eroîn e, di berîka wan de derket?" Dewlet dibêje: "Hûn xelet in; ew

ne eroîn e, ew axa tirba Bektaşî yê." çareke din dipirsîn: "Belê baş e, lê ew çi çekên giran ên bi dengkuji in ku di paşîya texsiyê de bûn, ew çi nasname û pasaportên keskin?" Îcar dewlet dimîne sekînî û dibêje: "Jixwe em jî li wan mame heyirî, wan îşê me xira kiriye û em xistine vê tengasiyê."

ZEKÎ ETİZ



Mêr e an jin e

Etarek ji erebên Sêrtê ji bo etariyê rojekê diçe gundê Dihê. Bi şev li mala mezinê gundê dibê mevan. Piştî şivê gundî li malê dixin. Çirokbêj dest bi çiroka "Rustemê Zal" dike. Çirok heta nivê şevê dom dike. Di dawiya çirokê de gundî bi hev re dibêjin: Sehextxweş, spas. Etar jî ji çirokbêj re spas dike û jê dipirse:

- Amê bidî xatirê Xwedê ew Rustemê Zal mêr bû an jin bû?

Nas dikî an na

Etarek bidlîsî ji gundên Hawilhan (Baykan) dizivire ku here mala xwe.

Di rê de leqayî leşkerê rom tê. Roja rezbera 1980'yî ye. Leşker li bêrîkên wî digerin. Ji ber ku nasnameya wî tune ye wî digirin û fînin Sêrtê dixin binçav. Sî û pênc roj her şev lê dixin, îşkenceyê dikin lê tu tiştî ji devê wî nagrin. Şevê îşkencevanek bihêrs jê dipirse:

- Tu Lenîn nas dikî an na? Ew bersivê dide:

- Welehî ku ji nava Bidlîsê be ez nas dikim, lê ji gundê Bidlîsê be ez nas nakim.

BEREH BERKEN

BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (89)

XAÇEPIRSA

H	L	U	K	G	E	R	G	E	R
W	E	H	A	M	A	R	Û		
Ç	A	W	T	A	M	A	S	T	
R	I	K	N	O	M	Î			
Ç	T	Î	N	E	P	Î	R	O	
N	Î	N	E	Z	Î				
T	Ş	E	X	T	E	R			
Ş	A	T	O	R	E				
T	E	Ş	Î	K	E	K			

PEYVA VEŞARÎ → CENGAWER

Karekî kirêt	Hejmarek	Cureyek masiyan	Hidrojen	Seyrangeh	Mastar
Ji şehidên peşin ên PKK'ê (Wêne)	Pê fûze tê avêtin	Lûtkeya serî	Tipek	... Elam	10
				Qet	
				Bîyan	
Zarf				Qanûn	
Rind, çak				Îzahkar	
		Gora Firavûn			12
		Law			
Berepaşki ker					
Gihaneke k	11	Naveki jinan			
	Kana avê	Mezin			
	Maktûp			Qertafa pirjmaryê ya bi tirkî	
				Fenok	
Naçe					
Roj	3			Qertafek	
				Cînavkek	
		Naveki mîran			
		Temen			
Dîroknas					
Çelik					5
	7			Notayek	

Bersiva Xaçepirsa 87'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 88'an, Pirtûka Torî ya bi navê "Kürtlerin İlkçağ Tarihi ve Kültürü" ye



Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîstin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmarê 87'an Kasetaya Xelil Xemgîn (NAME) qezenc kirine: Celal Yoldaş/Amed, Reşîrt Ertaş/Semsûr, M.Sait Saydut/Manisa, Ercan Gezgîn/Dîlok, Kenan Taşdemir/Qeyserî

PEYVA VEŞARÎ →

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12



WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNÎŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRİYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)

Munchen:
(Nünerê Giştî yê
Ewropayê)
Mahmut Gergerli
49 871 67 08 84

Brüksel:
Medenî Ferho
32 532 721 12 03

Suriye:
Jana Seyda
Helim Yûsiv
Berlin:
Silêman Sîdo
00 49 30 691 6495

Hannover:
Selîm Biçûk
49 572 18 13 60
Stockholm:
Robin Rewşen
46 87 51 05 64

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49
Hollanda:
S. A. Fewzî
31 104 85 55 43

Dagirkerî û xiyanet têk diçin

Livbaziye gerilayan di meha kewçêrê de li dora Wanê û Elbakê zêde bûn. Kontrola % 70'yê herêmê ketiye bin destê gerilayan. Riya Wan, Elbak û Culemergê ji heftê sibê heta 2'yên piştî nivro di destê hêzên dewletê de ye, piştî vê demê dikeve destê gerilayên ARGK'ê. Hêzên dewletê ketine rewşeke xerab û bi tenê qereqolên xwe diparêzin.

Du hefte di ser êrîşa artêşa tirk a li ser Başûr re derbas bû. Di çapemeniya tirk de qala kuştina 500 gerila tê kirin. Di bilançoya şer a generalên tirk de, tiştê dûrî aqilan hejmarên ku li ser xesara xwe didin e. Li gorî daxuyaniyên fermî yê dewletê di operasyonê bi tenê 4 leşker birindar bûne. Lê çavkaniyên herêmî û çavkaniyên ARGK'ê dimeneke cuda radixin ber çavan. Li gorî daxuyaniyên ARGK'ê heta nêzî 30 gerila di şer de can dane û beramberî vê yekê ji sedî zêdetir leşker û peşmergeyên PDK'ê hatine kuştin.

Çapemeniya tirk tevî ku qala kuştina bi sedan gerilayan dike jî cihekî bîrfireh nade nûçeyên şer. Li aliyê din çapemeniya tirk û generalên tirk herêma di bin kontrola YNK'ê de wekî hedef nîşan didin. Pisporek siyasî didin zanîn ku generalên tirk dixwazin êrîş bibin ser vê herêmê jî, lewre jî îdia dikin ku "gerila ji ber reviyane û ketine herêma di bin destê YNK'ê de." Lê nixandina berpîrsên YNK'ê bi awayekî din e. Nünerê YNK'ê yê Enqereyê Şazad Saib, roja 8'ê kewçêrê daxuyaniyek daye rojnameya Turkish Daily News. Saib dide zanîn ku PDK li hemberî PKK'ê têk diçe, lewre derewên bêbînî belav dike. Her wiha li gorî gotina Saib, ji ber ku leşkerên tirk herêmê nas nakin, di bi rêberiya PDK'ê dimeşin. Di heman nûçeyê de hinek dîtinên çavdêran cih girtine, ew dibêjin ku îcar artêşa tirk ji aliyê dem û kûrahiya ku wê pê de biçin de, tu sînor dananîne ber xwe.

Li gorî agahiyên ku bi dest dikevin artêşa tirk nikare li hemberî gerila encamekê bi dest bixe, tevî hemû hewl û cadên xwe nikare cihên stratejîk bi dest bixe. Li aliyê din çavçeyî Hacı Umran hê jî di bin dorpeça



gerilayan de ye. Dîsa tê gotin ku hêzên PDK'ê ji hev dikevin, gelek kesên ku naxwazin li hemberî PKK'ê şer bikin, dev ji şer berdidin û diçin herêma di bin kontrola YNK'ê de.

Digel Başûr şer li Bakur jî ji berê germ-tir bû, çalakiyên gerila zêde bûn. Nûçeya ku nûçegihanê me yê Wanê Elbakî ji me re bi rê kiriye, rewşê bi awayekî zelal li ber çavan radixe.

Çalakiyên gerila gur bûn

Livbaziye gerilayan di meha kewçêrê de li dora Wanê û Elbakê zêde bûn. Kontrola % 70'yê herêmê ketiye bin destê gerilayan. Riya Wan, Elbak û Culemergê ji heftê sibê heta 2'yên piştî nivro di destê hêzên dewletê de ye, piştî vê demê dikeve destê gerilayên ARGK'ê. Hêzên dewletê ketine rewşeke xerab û bi tenê qereqolên xwe di-

parêzin. Li gorî daxuyaniyên elbakiyan, hinek serokê leşkeran naxwazin şer bikin û kesên ku ji bo ajaniyê diçin cem wan, lêdana dixwin û guh nadin îxbarên wan.

Li aliyê din rewşa çaxşan pir xerab e. Ji ber êrîşên gerila êşîra Alan ketiye tengasiyê mezin. Di 4'ê kewçêrê de gerilayan du êrîş birin ser gundê Ala Xoxikê û gundê serekcaş Abdurrahman Seylan Sürmeliyê, li vir du caş hatin kuştin û çar heb jî birindar bûn. Ev gundên navborî bi navçeya Şaxê ve ne. Dîsa gerila êrîşek bir ser gundê Sêlê ya ku girêdayî nava Xawasor (Gürpınar), li vir jî dest danîn ser sê hezar pezên çaxşan.

Li gorî gotinan li Xawasor caş dixwazin çekan deynin, lê leşker nahêlin û dewleta tirk dixwaze 2 gundên berhevkerî damezirîne. Tê gotin ku wê 20 gundên Şax û Xawasorê bîn yalakerin.

NAVENDA NÜÇEYAN

MGK çeteyan diafirîne

û pişt re dide girtin

Bi qezeya Susurlukêre gelek fiştên qirêjî ku, ev bi salana li ser gelê kurd, bê wîdanî dihatin kirin û ji gelê Tirkîyeyê di hate vedîşartin derketin holê. Di ser bûyera Susurlukê re yanzdeh meh derbas bûn, lê hê jî encameke erênî derneketiye holê. Çalakiyên li hemberî çeteyan jî nû ve dest pê kir û bûyer jî nû ve hate rojevê.

Roja 4.10.1997'an li BEKSAV'ê panelêk bi ser navê "Derin Devletin İzdüşümleri (Dewleta kûr û rêç û şopên wê)" bi beşdariya hin kesên navdar wekî rojnamevan Celal Başlangıç, Parêzer Ergin Cinmen û Serokê Bâroya Stenbolê Yücel Sayman hate lidarxistin. Di wê panelê de dîtin û ramanên cur bi cur û rengin hatin zimên.

Sistemeke bi vî rengî li Şiliyê jî nîn e

Di destpêka panelê de parêzer Ergin Cinmen li ser pirsgrêkên giştî rawestiya û di axaftina xwe de bal kişand ser saziya heykariyê ya artêşê (OYAK). Cinmen diyar kir ku, komîteya rêveber a OYAK'ê jî hêla beşa MGK'ê ya leşkerî ve tê hilbijartin. Li gorî gotina Ergin Cinmen pêşniyaza beşa leşkerî ya MGK'ê jî bo komîteya rêveberiyê, bi ser pêşniyaza komîteya giştî dikeve. Yanê pêşniyaza 30 mirovî ya komîteya giştî, li hemberî 10 kesên ku ji aliyê beşa leşkerî ya MGK'ê ve hatiye neqandin, têk diçe. Parêzer Cinmen heyirmayîna xwe diyar dike û dibêje ku di cihanê de sistemeke bi vî rengî tune ye. Cinmen wekî mînak bi bir dixe ku bi salan e ku August Pinoşe serkaniya giştî ya artêşa Şiliyê dike, lê wî jî bir nebiriye ku sistemeke leşkerî, wekî ya OYAK'ê ava bike. Piştî van gotinan Parêzer Cinmen got: "Min lêkolîn kir, Tirkîye di wê tiratê de di nav dewletên cihanê de di rêza yekemîn de cih digire." Parêzer Ergin Cinmen di axaftina xwe de da zanîn ku li pişt MGK, rêxistineke ku xwediyê hêzê erjeng (korkunç) ya aborî heye, ev rêxistina ku navê wê nediyar e, li mijarên girîngtirin ên têkildarî jiyana me biryaran digirin. Cinmen diyar dike ku ev hêz di ser xwe re tu saziyên politîk nas nake. Cinmen di berdewama axaftina xwe de li ser partiyên siyasî jî rawestiya û da zanîn ku di çareserkerîna kêşeya kurd de partiyên siyasî bê politîka ne, heke politîkayek hebe jî, ya hemûyan wekî hev e. Bi awayê Parêzer Cinmen dide zanîn, îro du pirsgrêkên herî mezin ku li serê Tirkîyeyê bûne bela, yek kêşeya kurd e, ya din jî laîkî ye. Cinmen di berdewama axaftina xwe de got ku ji nav vî sistemê dewleta kûr derket holê. Parêzer Ergin Cinmen wekî sedema dewleta kûr jî şerê qirêjî destnîşan kir û got: "Dewleta kûr di şerê li Başûrê Rojhilat de bi tenê

nêzîkî pêncî milyar dolarî jî narkotîkê bi dest dixe. Dema ku dewleta kûr got hinekî jî em bixwin, erd û ezman hejriyan, di nav hêzên navendî de şerê dijwar dest pê kir û wî şerî em anîne hetanî îro."

Belgeyên veşarî qediyar

Rojnamevan û nivîskar Celal Başlangıç jî li ser bûyera Susurlukê, girîngiya dewleta kûr û rola wê ya li ser şerê qirêjî ramanên balkêş pêşkêş kirin. Rojnamevan Başlangıç daxuyand ku her kes dizane ku rêveberiya vî welatî ne di destê hikûmetên sivil de ye, wekî mînak jî xistina Refahyolê nîşan da. Wî pişt re bal kişand ser daxuyaniyêke İsmail Cem. Di wê daxuyaniya wî de tê gotin ku "Ji ber kesên ku rêveberiya Tirkîyeyê dikin, em di qada navneteweyî de wekî îşkencekar tên nasîn." Başlangıç diyar dike ku, İsmail Cem bi van gotina li xwe mikur tê û dide zanîn ku ew bi xwe jî rêveberan nahesibîne. Celal Başlangıç dazanîn ku, dewleta kûr di nav xwe de çete saz kirine. Bingeha dewleta kûr li ser şerê qirêjî saz bûye. Çeteyan ku li derveyî zagonên dewleta kûr tevdiagerin, encama şerê li Başûrê Rojhilatê Tirkîyeyê ye. Başlangıç li ser belgeyên veşarî yên ku artêşê hatine dizîn jî wiha peyivî: "Piştî bûyera Susurlukê ku belgeyên veşarî xelas bûn, ez bi hevalên xwe yên Enqereyê re axivim, 'Min got xêr e, hew agahî tenê destê me', bersiva wî hevalê me yî girîng balkêş bû û got, 'belge xeles bûn, tu kesî ew belge bi riya veşarî bi dest nexistine, mixabin herkesî bi riya dewletê ya fermî ew belge bi dest xistine, vêga ez bawer im ku meseleyê pêla xwe da serkaniya giştî, ji vir û pê de belgeyên veşarî nîn in.' Rojnamevan Başlangıç di dîmahîka axaftina xwe de diyar dike ku rojname û televîzyon jî rastiyê dizanin lê nabêjin. Başlangıç axaftina xwe wiha qedand: "Me dît ku yên vî şerî dimeşînin çeteyên di nav dewleta kûr de bi xwe



ne. Jixwe bûyer jî di wê derê de asê bûye. Lewre ew gihîştine sînorê ku serkaniya giştî danîbû ber wan."

Ev mekanîzmaya "kûr" biryara darbeyan jî distîne

Serokê Baroya Stenbolê Parêzer Yücel Sayman jî li ser "dewleta kûr" û hin pirsgrêkên giştî, ramanên xwe anîn zimên. Parêzer Yücel Sayman di destpêka axaftina xwe de li ser doza çeteyan wiha got: "Hetanî niha der heqê çeteyan de bi dehan doz hatine vekirin, lê DGM'ê ev doz tu carî bi hev ve girê nedane. Bûyer yekpare nehatiye fikirîn." Sayman di dîmahîka axaftina xwe de diyar dike ku di nav dewletê de çete û mete nîn e, rasterast dewleta kûr bi xwe van karan dike. Pişt re wî got: "Ev rêxistin ew qas xurt e ku wekî tercîh biryaren siyasî distîne, ji bo operasyonên li derveyî welêt biryaran distîne, li dewletên derveyî me biryaren darbeya distîne, biryaren cinayêten failî meçhûl distîne, li dijî PKK'ê biryaren stratejiya şer distîne. Her wiha li ba berpîrsên vî dewleta kûr tu giraniya hikûmeta sivil nîn e." Parêzer Sayman Dibêje: "Mekanîzmayeke ku van biryara distîne heye, li vir MGK wekî nav derdikeve pêş. Lê, li gorî agahiyan li derveyî MGK'ê mekanîzmayeke ku biryara distîne heye. Ev yek jî bi awayekî

koordîne tê çekirin, ji artêşê bigire hetanî hêzên ewlekariyê, ji merhaleya herî bilind a midûretiya ewlekariyê bigire, hetanî MÎT'ê, ji serokwezîrê di nav hikûmetê de bigire hetanî wezîran û parlamenteran, mekanîzma biryaren ku digihîje bürokratên mezin heye." Parêzer Sayman diyar dike ku hetanî ku mirov bi ser vî avahiya di nav dewletê de nekevin, nikarin vî bûyerê bi encameke erênî bi dawî bikin. Ji aliyên din ve Parêzer Yücel Sayman li ser xwe parastina kesên ku ji kirinên xwe wekî endamê çeteyan tên darizandin çend mînakên di de û dibêje: "Ew di xwe parastinê de mafdar in, lewre ew dibêjin ku tiştên ku wan ji dewletê re pêwîst bûn kirine. Ji ber xwe mirov li kuçe û kolanan nekustine, ji ber xwe darbeya Azerbeycanê saz nekirine, Di bin navê têkoşîna bi PKK'ê riya narkotîkê bi dest nexistine û li berjewendiyên xwe yê şexsî nefikirîne. Ev sistemek e, hin kesên payebilind ên di nav dewletê de ev biryar dane. Kes li dijî vî yekê derneketiye, wan jî ji bo dewletê ev kar pêk anîne." Parêzer Yücel Sayman di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku, heger K.T li ser vî bingehê ava bûbe, serokwezîr û wezîrên wekî Tansu Çiller û Mehmet Ağar jî jixwe dibin welatparêz û dostê dewletê.

AZAD ALTUN